CIVAK Û JIYAN

SERETAYÎ

3

2020/2019

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Civak û Jiyan ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- Komîteya Şopandinê

- Komîteya Fotoşopê

- Komîteya Redekteyê

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA 1 7

XWE NAS BIKIM..8

TAYBETIYÊN ME, BANDORÊ LI DERDORA ME DIKE 11

HILBIJARTINA HEVALÊN XWE 14

ÇALAKIYÊN DIBISTANA ME 18

EM BI HEV RE XURT IN 20

DERFETÊN XWE BAŞ BIKAR BÎNIN 22

PÎŞEYÊN XWE HILDIBIJÊRIN...................................25

BEŞA 2 31

JIYAN DI MALA ME DE 32

CÎRANTÎ 35

NEXŞE 37

EM BI HEV RE ALÎKAR BIN 39

TEKNOLOJÎ DI MALA ME DE 41

BAŞBIKARANÎN..44

GIRÎNGIYA ÇÊKIRINA BERNAMEYÊ 47

ROJA MAFÊ MIROVAN 50

BEŞA 3 53

JIYANA TENDURIST...54

KIRÎNA BIZANEBÛN 57

HER TIŞT DI DEMA XWE DE XWEŞE........................59

BILA HER DER PAQIJ Û XWEŞ BE............................63

BEŞA 4 67
JIYANA EWLE 68
JI BO RÊWIYAN PÎVANÊN ÇÛN Û HATINÊ 71
BALDAR BIN 74
BEŞA 5 77
WELATÊ ME PIR XWEŞ E 78
KOM DENDIKA CIVAKÊ YE 80
PERGALA ME 84
BIGERIN, BIBÎNIN, NAS BIKIN, HEZ BIKIN 86
GEL Û BAWERIYÊN DERDORA ME 90
BAWERIYA BÊ PÊXEMBER: ÊZDIYATÎ 92
RÊYA AŞTÎ Û BIRAYETIYÊ: XIRISTIYANÎ 95
OLA SELAMÊ: ISLAM 98
BI HEV RE KAR BIKIN Û BI HEV RE JÎ BI PARÊZIN 101
ROJA ZIMANÊ KURDÎ 104
BEŞA 6 107
JIYAN DI XWEZAYÊ DE 108
ŞÎNATÎ LI KU DEVERÊ Û ÇAWA ŞÎN TÊN? 112
ALIYÊN XWE NASBIKIN 116
TENDURISTIYEKE SAXLEM, BI PAKBÛNA XWEZAYÊ GENGAZ E 121
ROJA DAR Û DARISTANAN 125

BEŞA 1

ARMANCÊN BEŞÊ

1. **Xwendekar kêrhatiyên xwe nas bikin.**

2. **Xwendekar aliyên xwe yên xurt û lawaz nas bikin.**

WANE 1

XWE NAS BIKIM

Navê min Alan e, ez ji Efrînê me. Refa sêyem dixwînim. Ez wêneyan nîgar dikim û stranan jî dibêjim. Bi giştî ji hunerê hez dikim. Memoste, heval û malbata min, ji dengê min hez dikin û wêneyên ku ez nîgar dikim baş dibînin. Ji ber vê yekê, her dem ji min re dibêjin tu yê di hunerê de, bi pêş bikevî. Ez jî dixwazim bibim hunermendekî baş, lê hin aliyên min ên lawaz hene, mîna: Ez nizanim bi şetrencê bilizim.

Navê min jî Berçem e. Ez miroveke birêkûpêk im û dema xwe baş plan dikim. Ji ber vê yekê, di waneyên xwe de serkeftî me û dema min a vala çêdibe, ez ji xwe re dilîzim. Ez ji goga destan û şetrencê hez dikim, di wan de baş û serkeftî me. Lê hin milên min ên lawaz hene mîna: Têkiliyên min û hevalên min ne pir germ in, zû bi zû bi mirovan re nikarim têkiliyê deynim û nikarim li amûrên muzîkê jî bidim.

Navê min Aras e. Ez ji mamoste û hevalên xwe hez dikim û zû bi wan re dibim yek. Çîrokên ku dapîr û bapîrê min dibêjin, zû ji ber dikim, pir kêfa min ji wan re tê. Dema ez çîrokan ji ber dikim, ji hevalên xwe re dibêjim. Hin caran bi henekan hevalên xwe dikenînim. Lê di hin waneyan de lawaz im, bi taybet, bîrkarî ji min re zehmet tê.

Em hemû ji hev cuda ne û kêrhatî û jîrbûnên me jî cuda ne. Hinek ji me baş dinivîsin, dixwînin, şetrancê dilîzin, pisikletan dajon, melevaniyê dikin û hinek ji me jî di van mijaran de lawaz in, ango hin milên me xurt in û hinek jî lawaz in. Da ku em lawaziyên xwe derbas bikin û xurt bibin. Pêwîst e em xwe nas bikin û milên xwe yên xurt û lawaz jî nas bikin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Em li ser lênûsê, milên xwe yên xurt û lawaz binivîsin. Ji bo wê rûpela lênûsa xwe bikin du beş.

Milên me yên xurt	Milên me yên lawaz

2- Dema ku me ev tablo qedand. Tabloyeke nû çêbikin. Dîsa rûpela lênûsa xwe bikin du beş. Vê care jî, em milên xwe yên xurt çawa xurtir bikin û yê lawaz çawa xurt bikin, binivîsin.

Milên xwe yên lawaz çawa xurt bikim.	Milên xwe yên xurt, çawa xurttir bikim.

WANE 2

TAYBETIYÊN ME, BANDORÊ LI DERDORA ME DIKE

Mirov beşek ji zindiyên ku bi kom dijîn. Ji ber vê yekê, taybetiyên wan, bandorê li derdora wan dikin. Helwestên me, bandoreke erênî an jî neyînî, li me û derdora me, dikin. Helwestên baş, têkiliyên me bi hevalên me re xurttir dikin. Mînak: sibehê dema hevdîtinê silavdayîna birûkenî, parvekirina amûrên dibistanê, li ser waneyan bi hev re karkirin û alîkarîdayîn. Lê helwesta birûtirşî silavnedayîn, bi hevalên xwe re parve nekirin, alîkarî nedayîn, henek bi hevalên xwe kirin, helwestên ne baş in û têkiliyên me xirab dikin. Helwestên bi vî awayî, hin caran ziyanê didin me jî.

Mînak:

Alan û Sefwan li hewşa dibistanê bi goga pêyan dilîstin. Mamoste ji wan re got: "Herin pişt dibistanê bilîzin" lê Sefwan û Alan li mamosteyên xwe guhdar nekirin û neçûn. Dema Sefwan pêyê xwe li gogê da, gog li cama paceyê ket û cam şikest. parçeyên camê ser hevalên wî ketin, hinek ji wan bi sivikî birîn bûn.

Xwendekarekî telefona bavê xwe anîbû dibistanê. Di waneyê de li mamoste guhdar ne dikir, bi telefonê bi lîstokan dilîst û bi vî şêweyî nedihişt hevalên derdora wî jî waneyê baş guhdar bikin.

Bêrîtanê wê rojê, nobedara refê bû. Dema bêhinvedanê, derî û paceyên refê vekirin, cihê gemar bûbû, paqij kir.

Di nava rojê de helwestên bi vî rengî pir derdikevin. Hin ji wan dibin sedemên kêfxweşiyê û hin ji wan jî moralên mirovan xera dike. Heger helwestên me baş bin em ji aliyên hevalên xwe ve tên hezkirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Em dîsa ji xwe re tabloyekê çêkin û di nava rojê de çi helwestên baş û ne baş derdikevin û bandorên wan helwestan çi ne, binivîsin.

Helwestên baş	Bandorên wê	Helwestên ne baş	Bandorên wê

WANA 3

HILBIJARTINA HEVALÊN XWE

Derveyî malbata me kesên herî nêzîkî me hevalên me ne. Ji ber ku hevaltî tiştekî pir baş e, li ser rêzgirtin, alîkarî, rastî û dadê bi pêş dikeve. Cihê ku bêbawerî, nerastî, bêdadî, bêrêzî lê hebe hevaltî bi pêş nakeve.

Ji ber vê yekê, dema ku em hevalên xwe hilbijêrin, pêwîst e em baldar bin. Taybetyên wan nas bikin. Hevaltiyeke baş encax bi vî awayî bi pêş bikeve.

Eger em baş nêzîkî hevalên xwe bibin, wê hevalên me jî baş nêzîkî me bibin. Ji ber vê yekê mezinên me gotine: “Tu dixwazî hevalê te çawa nêzîkî te bibe, tu jî wisa nêzîkî wî bibe”.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çima tu ji hevalên xwe hez dikî?
2- Navên hevalên xwe binivîse.
3- Tu dixwazî bi hevalê te re çi taybetî hebin?
4- Ji bo tu hevalên xwe xurt bikî, tu yê çi bikî?
5- Dareke sêvan çêkin, taybetiyên hevalên xwe li ser sêvan binvîsin û bi darê vekin.
6- Peyvên ku li jêr hatine nivîsandin, di veşartokê de bibîne, li ser wan xêz bike, tîpên ku ma ne bîne gel hev û peyvên veşartî bibîne:
RASTÎ-BAWERÎ-HESTÎ-EVÎN-KEDKAR-WEKHEV-ALÎKAR-RÊZ

W	R	A	S	T	Î	A
E	D	I	L	N	I	L
K	B	A	W	E	R	Î
H	E	S	T	Î	Ê	K
E	V	Î	N	Z	Z	A
V	M	Î	B	A	Ş	R
E	K	E	D	K	A	R

CIHÊ DIBISTANA XWE NAS BIKIN



Weke çûkekî bi fikirin an jî wekî ku hûn di balafirkê de ne, li ser dibistana xwe difirin.

- **Hûn dibistana xwe çawa dibînin?**
- **Hûn baxçeyê wê çawa dibînin?**

Li gorî hin kesan, piçûkirina pîvanên cihekî û xêzkirina wî li ser lênûsê, nexşe tê gotin. Nexşe, xêzkirina tiştekî wek ku ji jor de tê dîtin e. Dema ku em nexşeyan xêz bikin, dam, milkêş, rastkêş, sêgoşe, bazin û hwd. bi kar tînin. Ji xwe cudahiya di navbera wêne û nexşeyan de ev e.

Nexşe, jiyana me ya rojane hêsantir dike. Mînak: Cihê dibistan û refên me diyar dike. An jî di taxê de cihê gulîstanan diyar dike. Dîsa dema em li bajêr an jî li kolanan li cihekî bigerin, ji nexşyê sûd werdigrin.

Her wiha di karê çêkirina rê, xanî û hwd. de tê bikaranîn.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di gulîstanê de çi heye, bi wêneyekî xêz bike. Piştre nexşeyekê ji wan re çêke.

2- Ji jor ve, cihê rûniştina xwe di nexşeyê de diyar bikin?

WANE 4

ÇALAKIYÊN DIBISTANA ME

Dibistan, ne tenê cihê xwendinê ye. Hin çalakiyên civakî, çandî û perwerdehiyê jî bi pêş dixe. Bi van çalakiyan, me ji bo jiyanê amade dike, têkiliyên dibistan û hawîrdorê bi pêş dixe. Bi me xwendekaran re jî bîr û baweriyê xurt dike. Bi van çalakiyan em erkên xwe baştir pêk tînin. Di dibistanên me de, çalakiyên cur bi cur tên lidarxistin. Mîna: Çalakiyên xwendekaran, çalakiyên ji bo malbatên xwendekaran û çalakiyên ji bo civakê.

Mînak: Ji bo xwendekaran çalakiyên werzişê li pêş dixin. Tîmên werzişê yên cuda çêdibin, di nav bera tîman de pêşbirk li dar dikevin, tîma ku bi ser dikeve, tê xelatkirin. Ev pêşbirk, di navbera dibistanan de jî çêdibin. Ji bo pêşxistina şetrencê jî pêşbirk tên amadekirin.

Di cejin û şahiyan de, amadekarî tê kirin. Di van cejin û şahiyan de helbest tên xwendin, stran tên gotin, govend tên gerandin.

Ji bo paqijiya derdorê, çandina daran û hwd, jî amadekariyan dikin. Carnan jî çalakiyên rengan li dar dixin.

Hin caran pêşangehan vedikin, tê de wêneyên ku xwendekaran rengîn kirine û kêrhatiyên wan tîn pêşkêşkirin.

Carinan bi malbatên me re, li ser rewşa dibistan û xwendekran, civînên agahdarkirinê çêdibin.

Ev hemû çalakî, ji bo ku civakîbûna me baştir bibe, tên çêkirin û em ji bo jiyanê baştir amade bin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1. Di dibistanên we de çi çalakî tên çêkirin?
2. Li ser çalakiyan wêneyekî çêkin?
3. Tu bêtir ji kîjan çalakiyan hez dikî?

WANE 5

EM BI HEV RE XURT IN

Pirtûkxaneya dibistana me pir biçûk e û pirtûkên tê de jî kêm in. Amûrên me yên dibistanê jî hindik in. Vê rewşê bandor li perwerdeya me dikir. Rojekê mamosteyê me got: "Bila her kes pirtûkekê ji pirtûkên malê bîne dibistanê. Bi vî awayî dê pirtûkxaneya me dewlemend bibe."

Li ser daxwaza mamosteyê me, her xwendekarekî pirtûkek anî dibistanê, me pirtûkên xwe danîn ser mêzeya mamoste, bi vî awayî gelek gelek pirtûk kom bibûn. Dema mamoste pirtûk dîtin, kêfxweş bû û keniya.

Eger ev pirtûk li mala we bimana, ji bilî malbata we keskî din sûd jê ne digirt. Lê niha, pir kes dê sûdê ji wan bigrin. Me bi alîkarî û piştgiriya hev, pirtûkxaneya xwe dewlemend kir. Alîkarî û piştgirî taybetiyên herî baş in. Civak bi van taybetiyên xwe dibe civak. Ev taybetî, civakê kêfxweş dike û me hîn bêtir nêzî hev dike.

Di welatê me de şer heye. Pir kesan ji ber vê sedemê, dev ji cih û warên xwe berdane. Hin kesan tenê

canê xwe xilas kirine û nikarîbûn tu tiştî bi xwe re bînin. Pêdiviya wan bi pir tiştan heye, bi taybet pêdiviyên zarokan.

Mînak: hûn dikarin lîstokên xwe li dibistanê kom bikin, bi zarokên kesên ku pêdiviya wan pê heye re, parve bikin. Da ku ew jî bi lîstokan bilîzin û kêfxweş bibin. Ev tişt ji bo cil û berg, lênûs, pênûs, jêbêr û hwd. jî derbasdar e.

Em bi tiştên wisa civakbûna xwe xurt dikin, bi hêz dikin, xwe û hevalên xwe kêfxweş dikin. Bi hev re xurt dibin. Dema ku em hev bigrin tu kes nikare bi me. Ji ber wê, bav û kalên me gotine: “Destek tiştekî wî heye, lê du dest her tiştên wan hene.”

WANE 6

DERFETÊN XWE BAŞ BI KAR BÎNIN

Em li dibistanê her dem mêze, nexşe, pênûsên depê, sabûn, av elektrîk û hwd, bi kar tînin. Di zivistanê de, mazotê jî bi kar tînin.

Em van tiştan çi qasî baş bi kar tînin û sûdê ji wan werdigrin?

Ji bo vê yekê, pêwîst e em çi bikin?

Alan destê xwe rakir û got:

- Bi roj, dema ronî be, pêwîstiya me bi elektirîkê tune ye, divê em glopan vemirînin.

Binefşê jî destê xwe rakir û got:

- Pirsgirêka dibistana me ya herî sereke av e: Gerek em henifiyên vekirî bigrin. Her wiha hin henifî xera bûne, av ji wan diçe, pêwîst e bên çakkirin, an jî bên nûkirin. Bi vî awayî dê av pir neyê mezaxtin.

Ronî jî destê xwe rakir û got:

- Li destşoyê, dema em destên xwe bişon, sabûnê baş bi kar bînin. Sabûnê navêjin erdê û di nav avê de nehêlin, da ku zû neqede.

Dilgeş jî destê xwe rakir û got:

- Zivistan pir sar e. Ji bo ku em germ bibin, mazotê bi kar tînin. Dema ku hewa sar be, paceyan gelekî venekin, da ku em sar nebin.

Nalînê jî destê xwe rakir û got:

- Pênûsên ku em pê li ser depê dinivîsin, pêwîst e bêsedem neyên bikaranîn. Tenê dema ku pêwîstî bi nivîsê hebe bên bikaranîn û devê wan vekirî nehêlin, da ku zuha nebin.

Hûn hemû rast dibêjin û em hemû van tiştan dizanin. Lê pêwîst e ev tiştên ku em dizanin bi me re bibe helwest û pîvan. Em ji bîr nekin, derfetên me kêm in. Dibe ku ev derfetên me zû biqedin. Dema mazot tune be em ê bi cemidin. Dema elektirîk tune be em ê di tarîtiyê de bimînin. Dema ku av û sabûn tune be, em ê paqijêyê nekin û nexweş bikevin. Ji bo vê yekê, pêwîst e em derfetên xwe baş bi kar bînin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Derfetên dibistana we, çi ne?

2- Hûn derfetên dibistana xwe çawa bi kar tînin?

3- Ji bo em derfetan baş bi kar bînin, pêwîst e em çi bikin? Ji bo wê nîgarekê çêkin û gotinekê li ser binivîsin?

WANE 7

PÎŞEYÊN XWE HILDIBIJÊRIN

Bi vebûna derî mamoste hat refê. Em hemû rabûn ser pêyan. Mamoste got “rojbaş”. Me bi hev re bersiva mamosteya xwe da û em li cihê xwe rûniştin.

Îro waneya me li ser pîşeyan e. **Derdora me çi pîşe hene? Çi taybetiyên wan pîşeyan hene? Dema hûn mezin bibin, hûn dixwazin di kîjan pîşeyê de bi pêş bikevin?**

Binefş, destê xwe rakir û got:

- Mamoste, pîşe çi ye?

- Pîşe, karbeşiya di nava civakê de ye û di van karbeşiyan de pisporbûn e. Mînak: bijîşkî, mamostetî, dartiraşî û hwd, pîşe ne. Mirov nikare hemû pêdiviyên xwe, bi xwe peyda bike. Ev pêdivî hin kes çêdikin. Ev karbeşiya nav civakê ye û pîşe li ser vê pêş ketine. Her pîşe girîng e, lê taybetiyên wan yên cuda hene û

zanebûn û kêrhatinê dixwaze. Ji ber vê yekê, em li gorî zanebûn û kêrhatiyên xwe, pîşeyên xwe diyar bikin. Mînak: Nanpêj tune bin, em ê bê nan bimînin, bijîşk tune bin dê nexweş rehet nebin. Terzî tune bin, em ê tazî bimînin.

- Binefşê, careke din destê xwe rakir û got:

Spas mamoste, dema ku ez mezin bibim, ez ê bibim asayîş, ji bo ez malbat û hevalên xwe ji bûyeran bi parêzim.

- Alan jî rabû û got:

Ez dixwazim bibim bijîşk û nexweşan baş bikim û alîkariya wan bikim.

- Baran jî rabû û got:

Ez dixwazim bibim porbir û porên hevalên xwe bibirim û wan xweşik bikim.

- Azad:

Ez dixwazim bibim mamoste û xwendekaran fêrî zanistê bikim.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li derdora we, çi pîşe hene?

2- Di jiyana me de bandora pîşeyan, çi ye?

3- Tu dixwazî di kîjan pîşeyê de bi ser bikevî û ji bo wê tu yê çi bikî?

ROJÊN DIYAR

ROJA AŞTIYA CÎHANÊ

Roja aştiya cîhanê, ji bo ku di cîhana me de aştî çêbibe û mirov di nav aramiyê de bijîn, ji aliyê yekîtiya neteweyan (YN) ve hatiye diyarkirin.

Di 1 rezbera 1939'an de artêşa Almanyayê di bin fermandariya Adolf Hitler de êrîşî Polonyayê kir û ew dagir kir. Ev dagirkerî bû sedem ku şerê cîhanê yê duyem dest pê bike.

Her çi qas di vî şerî de Yekîtiya Sovyetê bi ser ketibe jî, nêzî 25 milyon mirovên wê jiyana xwe ji dest dan û Yekîtiya Sovyetê wêran bû.

Yekîtiya Sovyetê û dewletên hevalbendên wê, ji bo şerê cîhanê yê duyem neyê ji bîr kirin, roja ku şer dest pê kir, wek roja aştiya cîhanê pîroz dikirin.

Dema yekîtiya Sovyetê têk çû, yekîtiya neteweyan, 21 rezberê wek roja aştiya cîhanê diyar kir. Niha di nav neteweyî de 21'ê rezberê, weke roja aştiyê ya cîhanê tê pîrozkirin.

Di roja aştiya cîhanê de, daxwaza aştiyê tê kirin, ji bo aştiyeke cîhanî û mayînde têkoşîn tê meşandinû çalakiyên cur bi cur tên lidaxistin.

BEŞA 2

ARMANCÊN BEŞÊ

1. **Naskirina malbata xwe**
2. **Pêşxistina cîrantiyê**
3. **Pêşxistina jiyaneke bibername**

WANE 1

JIYAN DI MALA ME DE

Dayîka Binefşê, di malê de, bi tozmijê, derdor paqij dikir. Binefşê jî alîkariya wê dikir, paçek xistibû destên xwe û mêze pak dikirin. Ji bo ku Binefş, dolaba cilan paqij bike, destê xwe avêt deriyê dolabê, deriyê wê vebû û wênedanka wêneyan jê ket. Binefşê, wêndank girt û rûpelên wê zivirandin. Hin wêne hebûn, qet nas ne dikirin. Binefşê wêndank girt û çû gel dayîka xwe. Tiliya xwe danî ser wêneyekî û got:

- Dayê ev kî ne?

Dayîka wê got:

- Bisekine, piştî ku ez karê xwe bidawî bikim, ez ê ji te re bibêjim. Binefşê, destê xwe lez kir, tiştên ku paqij nekiribûn, paqij kirin. Dayîka wê jî karê xwe bidawî kir. Binefş çû gel dayîka xwe û rûnişt, dayîka wê pelên wênedankê zivirand û dest pê kir.

Ev bapîr û dapîra te ne, ev jî ez û bavê te ne û zaroka bicûk jî tu yî.

Dayîka Binefşê, peleke din zivirand, wêneyekî kevin reş û spî yê zarokekî hebû. Cilên wî reş bûn, porê wî ji binî ve hatibû kurtkirin.

- Ev jî bavê te ye, dema çûye dibistanê. Li dibistanên wê demê wisa bûn, cilekî reş li xwe dikirin, porê xwe ji binî ve kurt dikirin û çenteyên wan jî tune bûn. Wê demê wek niha makineyên dijital û bireng jî tune bûn.

Binefş:

- Dayê, lîstokên we çi bûn?

Dayîka wê:

- Ez, xaletên te û cîraneke me, her dem bi hev re pênc kevir, veşartok û xêzikê dilîst.

Binefş:

- Dayê, pênc kevir çi ye û çawa tê lîstin?

Dayîka Binefşê, jê re pênc kevir çi ye û çawa tê lîstandin yek bi yek şîrove kir.

Dayîka wê:

Di dawiyê de:

- Ji bîr neke Binefş, ku demekê em jî weke we zarok bûn, me dilîst û piştre em mezin bûn. Dema em biçûk bûn, diçûn ber lawiran. Çêlekeke me jî hebû, me her sibeh ew dibir diçêrand, êvarê dereng dianî malê. Dayîka min çêlek didot û me şîrê wê vedixwar, mastê me her tim hebû.

- Aha ev wêneyê min e, dayîka me ji me re paçên lîstokan çêdikirin. Bavê min ji min û xalê te Cemîl re ji têlan erebe û ji depan hin amûrên lîstokan çêdikirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Wêneyê malbata xwe yê kevin û yê nû bînin ber hev, çi cudahî di navbera wan de heye?

2- Ji dê û bavê xwe bipirsin, di zaroktiya wan de çi lîstok hebûn?

3- Heger sax bin, ji dapîr û bapîrên xwe awayê jiyana wan bipirsin û bi jiyana xwe re hevrû bikin?

WANE 2

CÎRANTÎ

Dema Baran ji dibistanê zivirî malê, dît ku li ber deriyê wan gengeşeyek heye, mereq kir û nêzîkî gengeşeyê bû, dît ku maleke nû bûye cîranê mala wan. Hinekî sekinî, piştre çû malê. Tiştê ku li kolanê dît, ji dayîka xwe re got.

Dayîka wî jê re got:

- Mala kêleka me vala bû, yekî nû mala xwe anî vir, cîranekî me yê nû çêbû.

Kêfa Baran hat, ji ber cîranekî wan ê nû çêbûye û dê bi zarokên wan re bilîze.

Baran: Dayê cîran û cîrantî, çi ne?

Dayîka Baran: Kesên ku di heman kolanê de dijîn, mala wan nêzîkî hev be dibin cîranên hev. Cîrantî li ser hezkirin, rêzgirtin, parvekirin û alîkariyê bi pêş dikeve. Pêwîst e cîran hev û du bêzar nekin. Helwestên bêzariyê tu carî raber nekin. Dema hevdîtinê, li rewşa hev bipirsin.

Cîranê baş, wek endamên malbatê ne. mirov ji wan pişt rast û biewle ne. Tiştek çêbibe, despêkê cîranê me têne hawara me, ji bo wê, pêwîst e em cîranên xwe baş nas bikin.

Pêwîst e em bi dengê xwe cîranên xwe bêzar nekin. Qirêjî û gemarê neavêjin hewşa wan û dema alîkarî pêwîst be, alîkariyê bidin hev.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Cîranê we kî ne?
2- Hûn bi zarokên cîranê xwe re çi lîstokan dilîzin?
3- Cîranê baş, çima wek endamê malbatê ye?

WANE 3

NEXŞE

Êvarî dema bavê Dilgeş hat malê, Dilgeş bi bavê xwe re axivî.

Dilgeş: Bavo, rojbûna min nêzîk bû ye. Em ê çi bikin?

Bavê Dilgeş: Ohooo, tu saleke din mezin bûyî. Em ê ji bo rojbûna te şahiyekê çêkin.

Dilgeş: Ez dixwazim hevalên min ên dibistanê jî werin şahiyê.

Bavê Dilgeş: Temam, bila bên.

Dilgeş: Hevalên min ên dibistanê, hemû mala me nas nakin, nizanin bên mala me.

Bavê Dilgeş: Ji wan re cihê mala me pênase bike.

Dilgeş: Çi bêjim? Nizanim.

Bavê Dilgeş: Ka pênûs û kaxezekê ji min re bîne. Ez ê nexşeya mala me çêkim, tu jî bide hevalên xwe yên ku mala me nas nakin.

Dilgeş, bi kêfxweşî çû ji çenteyê xwe pênûs û kaxezek anî û da bavê xwe.

Bavê Dilgeş: Li dibistanê, we waneya nexşeyê dîtiye?

Dilgeş: Rast e bavo, mamoste nîşanî me da.

Bavê Dilgeş: Wê çaxê em niha nexşeyekê çêkin.

Bavê Dilgeş, li ser kaxezê xêz kir. Ev der mala me ye, ev jî rê ye, ev dikanên li ser rê ne, mizgeftek li wir heye. Piştî mizgeftê em tên rêya pêşiya dibistana we. Ev jî gulîstana kêleka dibistana we ye.

- Vê bide havalên xwe. li gorî vê nexşeyê ji dibistanê, wê mala me bibînin.

Dilgeş, kaxez ji bavê xwe stand, spasiya bavê xwe kir û bi kêfxweşî pênûs û kaxeza ku nexşe li ser bû xist çenteyê xwe.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li derdora mala we, çi heye?

2- Di hewşa mala we de çi heye?

3- Nexşeya mala xwe çêkin?

WANE 4

EM BI HEV RE ALÎKAR BIN

Navê min Zîlan e. Ez li malê alîkariya dayîka xwe dikim. Di mala me de karê malê zû bi dawî dibe. Çawa?

Di malê de, me kar di nav xwe de dabeş kiriye. Her endamekî malê karekî dike. Eger, yek kes karê malê hemî bike, dê pir biweste û kar dereng bikeve. Ev ne tiştekî baş û dadî ye. Di karê malê de alîkarîdayîn, hezkirin û rêzgirtinê xurt dike. Ji ber wê em hemû karê malê bi hev re dikin.

Mînak: Ez lîstokên xwe kom dikim, toza li ser mêzeyan paqij dikim. Birayê min Alan, gulan av dide û bavê min di danîna sifreyê û firax şûştinê de alîkariya dayîka min

dike. Ji ber wê karê mala me zû bi dawî dibe û tu kes naweste. Em bi hev re demeke xweş derbas dikin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di mala we de karê malê, kî dike?
2- Di karê malê de karbeşî heye?
3- Li gorî tabloya li jêr, karê malê kî dike binvîsînin?

Karê malê	Herî zêde kî dike
Xwarin çêkirin	
Ji dikanê nan standin	
Avêtina gemarê	
Danîn û komkirina sifreyê	
Şûştina firaxan	
Şûştina cilan	
Çûyîna bazarê ji bo mêwe û şênatiyan	
Komkirina lîstokan	
Sererastkirina baxçeyê li ber malê	

- Kî gelekî kar dike?
- Ev karbeşî wekhev û dadî ye yan na û çima?

WANE 5

TEKNOLOJÎ DI MALA ME DE

Berfîn, dayîk û bavê xwe ji bazarê dihatin. Qederek tişt kirîbûn, bi zor gihiştin malê. Di nav xwêdanê de mabûn û pir westiyabûn. Tiştên ku kirîbûn danîn pêjgehê û hatin rûniştin.

Dayîka Berfînê got:

Ez ê hinekî bêhina xwe vedim, piştre tiştan sererast bikim. Bavê Berfînê jî destê xwe avêt rîmotê û li televizyonê tamaşe kir. Berfîn jî hinekî li dayîk û bavê xwe nerî û got:

Dayê, çima me ewqas tişt ji bazarê kirîn û xwe westand? Ma, xera nabin?

Dayîka Berfînê: Na keça min, xera nabin. Ma, me sarinc ji bo çi kirîye? Sarinc, sebze û mêweyên ku em dikirin demeke dirêj diparêze. Ji dêvla her roj biçin bazarê û bi westin, bi carekê re diçin tînin. Hem erzan tînin û hem jî ewqas dema me naçe.

Bi vî awayî teknolojî jiyana me hesantir dike. Heger ew tune bin, dê jiyan pir zehmet bibe.

Mînak: Ev tozmij tuneba, min ê saetekê nikarîba bi melkesê hundirê malê bimalaşta. Heger ev cilşo tuneba,

min ê ev cil û perde hemû bi destan bişûştana û dema min nedima ku ez ji we re xwarinê çêkim. Bi saya van amûran, ez pir nawestim û tiştên baş ji we re dikim û dema min dimîne ku em bi hev re biaxivin.

Berfîn: Li gel sûdên wan, ziyanên wan jî tune ne?

Dayîka Berfînê: Çawa tune ne, keça min. Beriya her tiştî pir buha ne û mezaxtina wan pir e. Heger baş neyên bikaranîn dê zû xera bibin. Pêwîst e berî em wan bi kar bînin, rêbazê bikaranîna wan bixwînin û bizanin.

Her wiha, heger em wan gelekî bi kar bînin, dê bandoreke nebaş li jiyana me bikin. Bi taybet televizyon, kompûter, telefon, pileystêşin û hwd.

Tu vî wêneyî dibînî? Bikaranîna wan ya şaş, mirovan wisa dike. Ji ber wê pêwîste em wan baş bi kar bînin.



PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di mala we de çi tiştên teknîkî hene?

2- Hûn tiştên teknîkî çawa bi kar tînin?

3- Heger tiştên teknîkî tunebûna dê jiyana me çawa bûya? Bihizirin û binvîsin.

4- **Bersiva van mamikan bidin:**

a- Li Amedê şîr rijiya, behina wê hate vir.

b- Sindoqa tije têl, deng dide pêl bi pêl.

c- Nedixwe, ne jî radizê, bi şev û roj kar dike, naweste.

WANE 6

BAŞ BIKARANÎN

Em derfetên xwe çi qas baş bi kar tînin? Ji pêwîstiyên xwe bêtir bikar tînin, an na?

Li dibistanê, mamoste lêkolînek li ser mezaxtinê, wek karê malê dabû Alan û hevalên wî. Dema ji dibistanê derketin û ber bi mala xwe ve dihatin, li ser vê mijarê guftûgo dikirin. Lê hin tişt di serê Alan de rûneniştibûn. Ji hevalên xwe re got:

- Ez ê vê mijarê bi dê û bavê xwe re giftûgo bikim, piştre binvîsim. Alan, ji hevalê xwe veqetiya û çû malê.

Êvarê Alan û malbata xwe li televizyonê tamaşe dikir. Nûçeyek li ser tiştên ku her sal tên avêtin hebû. Bi taybet, otêlên pêncstêrk û mezin di mezaxtinê de li pêş bûn. Piştî vê nûçeyê, nûçeyeke birçîbûnê derket. Zarokên Afrîkî ji birçînan, pir zeyif û lawaz bûbûn.

Dema nûçe qediya, Alan sedemên van ji bavê xwe pirsî.

Bavê Alan: Ev cîhan pir mezin e û têra me hemûyan dike. Lê hinek kes çavbirçî ne. Dixwazin her tişt ji wan re be. Bi zorê û hin rêbazên cuda dewlemendiyên cîhanê xistine destên xwe. Li hin cihan mirov ji birçînan dimrin û li hin cihan jî xwarinê diavêjin. Li hin cihan zarok bê şîr dimrin û li hin cihan bi şîr serê xwe dişon. Em di cîhaneke newekhev de dijîn, ji bo wê dibêjin: **"feqîrtî ji tune bûnê nayê, ji parvekirina neadil û newekhev tê".**

Belkî em nikarin cîhanê biguherînin, lê em dikarin di mala xwe de tiştan nemezêxin. Mezaxtin tiştekî nebaş e.

Mînak: Pêwîst e, em li gorî pêwîstiya xwe xwarinê çêkin. Heger em pir çêkin, wê bimîne û xera bibe û em ê biavêjin. Nan jî wisa ye, em nan pir bînin, wê kevin bibe û neyê xwarin. Av rojekê tê, du- sê rojn nayê, gerek em ava xwe jî baş bi kar bînin. Henefiyan vekirî nehêlin û henefiyên ku xera bûne, biguherin. Bi şev dema ku em razin gilopên odeyên xwe vemirînin.

Bi van rêbazên cur bi cur em dikarin pêşiya mezaxtinê bigrin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di mala we de mezaxtin çêdibe?
2- Çawa em dikarin li mal û dibistanê pêşiya mezaxtinê bigrin?
3- Li ser mezaxtinê dirûşmeyekê, an jî nîgarekî çêkin û vê dirûrişmeyê an jî nîgarê li dibistanê deyînin.

WANE 7

GIRÎNGIYA ÇÊKIRINA BERNAMEYÊ

Îro di dibistanê de mamoste li ser bernamekirina jiyanê axivî.

Mamoste got, bername jiyana me bi rêk û pêk dike. Çêkirina bernameyê rêya serkeftinê vedike. Bernameyeke baş, nîvê karkirinê ye. Ji ber vê yekê, em ê bernameyekê çêkin. Kîjan kar ji bo me girîng e, em wan rêz bikin. Ji bo van karan pêk bînin, çi qas dem pêwîst e diyar bikin. Bi vî awayî em ê bibin xwediyê bernameyeke baş û serkeftî.

Piştî xwarina êvarî, Remsa, tiştên ku mamosteya wê li dibistanê gotibûn ji dayîka xwe re got û ji bo bernameyekê ji xwe re çêke, alîkarî ji dayîka xwe xwest.

Dayîka Remsa: Ka lênûs û pênûsa xwe bîne. Em bi hev re bernameyekê çêkin.

Remsa bi kêfxweşî çû ji çenteyê xwe lênûs û pênûsa xwe derxistin û hat gel dayîka xwe.

Dayîka Remsa: Ka tu di rojekê de çi karî dikî, wan binvîse.

Remsa: Ji xew, heya çûna dibistanê, bi hevalên xwe re lîstin, xwarin û jiyana xwe ya rojane nivîsand.

Dayîka Remsa: Ev tiştên ku te nivîsandin, ji bo wan çi qas dem pêwîst e, wê jî binvîse. Mînak, seat çend tu diçî dibistanê, di rê de çi qasî dema te diçe, çi qasî bi hevalên xwe re dilîzî, çi qas karê malê dikî, çi qasî alîkariya min dikî, hemûyan binvîse.

Ku te dem jî nivîsand, kîjan ji bo te girîng e, wê jî bîne pêşî. Bi vî awayî te bernameyeke baş nivîsand. Çêkirina bernameyê nîvê kar e, nîvê din, girêdan û pêkanîna bernameyê ye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Em di rojekê de çi dikin?
2- Sûdên çêkirina bernameyê, çi ne?
3- Mirovê bê bername, çawa jiyan dike?
4- Vê tabloyê dagrin.

Karê ku ez îro bikim	Seatên wê

ROJÊN DIYAR

ROJA MAFÊ MIROVAN

Roja mafê mirovan di 10'ê berfanbarê de, li Cîhanê tê pîrozkirin. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, di nav dewletan de, hin gav di sererastkirin û pêşxistina mafê mirovan de hatin avêtin. Di vê başkirin û pêşxistinê de, mafê berxwedana gelan jî hat diyarkirin.

Ji despêkirina şaristaniyê heya sedsala navîn, mirov bi zorê dihatin birêvebirin. Mirovên ku ji hemû mafên xwe hatibûn dûrxistin, kiribûn kole. Mirovahiyê, tu carî ev jiyan nepejirîndiye û li hemberî vê têgihiştinê, têkoşîn daye meşandin.

Di dawiyê de Yekîtiya Netewan, di civîna 1948'an de, di derheqê mafê mirovan de hin biryar standin. Mîna: Mirov ji rengê çermê xwe, ji ol û baweriya xwe, ji zayenda xwe, ji netew û zimanên xwe nayên sûcdarkirin. Mirov wek zindiyekî, ji çêbûna xwe ve, xwedî maf e û tu kes, an tu hêz nikare van mafan jê bistîne, an jî sînordar bike.

Mirovên kole tune ne. Di jiyanê de, bi zordarî tê kolekirin. Desthilatdar, mirovan ji van mafên wan bêpar dihêlin û desthilatdariya xwe xurt dikin û xwe dikin, xwedayên wan. Lê mirov wekhev in, nabe yek bibe serdestê yekî din û xwe bike xwedayê yekî din.

Em ji bîr nekin ku neheqiyek li mirovekî bibe, weke ku li hemû mirovan tê kirin.

BEŞA 3

ARMANCÊN BEŞÊ

1- Naskirina tenduristiyê.

2- Di tenduristiyê de girîngiya tîmarbûn, werziş û paqijiyê.

WANE 1

JIYANA TENDURIST

Ji bo jiyaneke tendurist û baş, pêwîst e em li xwe û derdora xwe binerin.

Paqijî du beş in:

- Beşek, paqijêya mal û derdorê ye.

- Beşa din jî, paqijiya kesayetî ye, an jî ya laş û cilên me ye.

Heger em qirêj bin û cilên me qirêj bin wê hevalên me henekên xwe bi me bikin û bi me bikenin.

Ji bo paqijiya derdor û kesayetî pêwîst e em çi bikin?

Dema sibehê ji xew radibin, pêwîst e em dest û rûyê xwe bi av û sabûnê bişon, lê gerek e em avê pir nemezêxin.

Dema me xwarin xwar, an jî beriya razanê diranên xwe firçe bikin, daku diranên me xera nebin. Ji bo vê pêdiviya me bi av, firçe û macûnê heye. Pêwîst e em macûnê pir bi kar neyînin. Pir bikaranîna macûnê ne baş e. Her wiha mezaxtina ava pir jî ne baş e. Em hemû endamên malê, dikarin bi hev re macûnekê bi kar bînin, lê ji bo tenduristiya me, pêwîst e firçeyên me cuda bin.

Her wiha dema laşê me qirêj bû, pêwîst e em xwe bişon. Her du-sê rojan carekê em serê xwe bişon baş e. Dema werşiz dikin, dilîzin xwêdan didin, wê çaxê jî pêwîst e em xwe bişon. Heger xwe neşon, xwêdana me dibe bêhin û derdora me bêzar dike. Ji bo xwe şûştinê av, sabûn, şampo û lûfik pêwîst in. Laşê xwe baş sabûn bikin û xwe bişon. Di por û laşê xwe de sabûnê nehêlin.

Li gel laşê xwe cil û bergên xwe paqij bihêlin û dema ku gemar bûn bişon.

Ji bo jiyaneke tendurist û xweşik bijîn, pêwîst e xwe paqij bikin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Em ji bo paqijiya laşê xwe çi dikin?

2- Tu çawa paqijiya xwe dikî?

3- Amûrên paqijiya me çi ne?

WANE 2

KIRÎNA BIZANEBÛN

Em di jiyana xwe ya rojane de pir tiştan dikirin û debara xwe li ser wan dikin. Ji bo jiyaneke tendurist, pêwîst e tiştên ku em dikirin baş û pak bin. Tiştên xerab nekirin, pir mezaxtinê nekin û mezaxtina me li gorî muçeya malbatê be.

Mînak: Binefş, dayîk û bavê xwe, ji bo pêwîstiyên malê diçûn firoşgehê. Di rê de Binefşê ji dayîk û bavê xwe re wiha got:

- Îro di waneyê de mamosteyê me got: Tiştên ku hûn ji firoşgehan bikirin, li dîroka wê binerin, heger dîroka wê derbas bûbe, an jî dîrok li ser tune be nekirin.

Dayîka Bêrîtanê:

- Mamosteyê we rast gotiye. Niha em diçin firoşgehê û em ê gotinên mamosteyê te, pêk bînin.

Bêrîtan: Bavo em vê biskewîtê bikrin?

Bavê Bêrîtanê: Em bikirin, lê belê tiştên ku hatine pakêtkirin gereke baş bi şopînin. Pakêtên qetyayî, pakêtên xwarbûyî, pakêtên xerabûyî nekirin û derbasbûna dîroka wan jî, ji bîr nekin.

Dayîka Bêrîtanê, qutiyeke ava bacanan ji refikê girt. Qutî bir ber pozê xwe, rûyê wê tirş bû. Bêhineke nexweş ji qutiyê dihat. Zivirand li dîroka wê nerî, hîn dîroka wê derbas nebûbû, lê bêhin dida.

Her çi qasî dîroka wê derbas nebûbe jî, lê qutiya wê werimiye û bêhin dide. Pêwîst e tiştên bi vî awayî jî em nekirin. Bêrîtan, dê û bavê wê tiştên ku ji wan re pêwîst bûn, kirîn û vegeriyan malê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di kirîna tiştan de pêwîst e em li çi baldar bin?
2- Biskewîtên ku te ji firoşgehê kirîne, çi li ser pakêta wan nivisîne?
3- Tiştên ku vekirî têne firotin, çi bandorê li tenduristiya mirovan dikin?

WANE 3

HER TIŞT DI DEMA XWE DE XWEŞE

Bazar cihê kirîn û firotinê ye. Her heftî roja yekşemê, di taxa Alan de bazar çêdibe. Şêniyên bajêr pêdiviyên xwe ji wê bazarê dikirin. Gundî jî tiştên xwe yên ji bo firotinê tînin vê bazarê û difiroşin.

Alan jî pir dixwaze biçe vê bazarê. Di dema ku ew roj navbera dibistanê be, bi dayîk an jî bi bavê xwe re diçe bazarê û pir kêfxweş dibe. Dema firoşkar diqîre, bi baldarî li wan temaşe dike. Ew bi xwe, dixwaze bibe firoşkar.

Alan her ku diçû bazarê didît ku sebze û mêweyên ku di bazarê de têne firotin, tên guhertin. Hin caran, pirteqal, lîymon, ananas, mandelî pir dibûn û hin caran jî zebeş, petêx, tirî û gêlyaz pir dibûn.

Alan: Bavo, çima her ku em têne bazarê, sebze û mêwe tên guhertin?

Bavê wî:

- Alan, dema her sebze û mêweyekî cuda ye. Her sebze û mêwe di her demê de çênabin. Hin sebze û mêwe havînê çêdibin, hin ji wan payîz û zivistanê çêdibin. Ji ber wê her tim tên guhertin. Dema tu li sebze û mêweyan dinerî, dizanî tu di kîjan demsalê de yî. Niha hinar, pirteqal, lîymon û ananas pir in. Ev jî tê wateya ku em di demsala zivistanê de ne. Hin caran sebze û mêwe ne di demsalên xwe de jî tên bazarê. Ev sebze û mêwe yan ne yên vê deverê ne, yan jî bi dermanan hatine çêkirin. Lewre jî pir buha ne.

Alan û bavê xwe pêdiviyên xwe kirîn û çûn malê. Dayîka Alan ji bo êvarê xwarina giya (spanax) çêkiribû. Dilê Alan ne diçû xwarinê, bê dilê xwe gepek xwar û dev jê berda.

Dayîka wî:

- Alan, pêwîst e tu xwarina xwe bixwî. Spînax ji bo laşê me baş e û bi taybet ji bo çavên me baş e. Heger xwarina me hev temam neke, tenduristiya me dê xira bibe. Ji ber ku her sebze û mêweyek, sûdeke wê ji bo laşê me heye.

- Pêdiviya laşê me bi protîn, vîtamîn, zeyt û hwd, heye. Em ji nan, petat, mekerûn, birinc û hwd, enerjiyê distînin û ji mêweyan vîtamînan distînin. Vîtamîn me ji sermayê diparêzin.

Tiştên ku em pê debara xwe dikin, dibin du beş: Beşek ji şînatiyan, fasûlî, nok, genim, nîsk hwd; beşek ji lawiran, goşt, şîr, hêk, mast, hingiv û hwd, pêwîst e em ji her duyan jî bixwin.

Pêwîst e em di dema wê de û têra xwe bixwin. Divê xwarina me cur bi cur be û hev temam bike. Lê hema çi kete destên me, em nexwin. Bi vî awayî xwarin, bandorê li tenduristiya me dike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Sebze û mêweyên havînê, çi ne?

2- Sebze û mêweyên ku bandorê li tenduristiya me dikin, çi ne?

3- Tîmarên temamker çi ne?

4- Bersiva van mamikan bidin:

a- Gayê beş, dendik reş, tam xweş, tê hurkirin beş bi beş.

b- Vî alî hestî, vî alî hestî, di nav de şekirê bestî

c- Bav şêrîne, kur şêrîne, nevî dîne.

d- Dayîk şîne, keç şêrîne, keça keçê har û dîne.

WANE 4

BILA HER DER PAQIJ Û XWEŞ BE

Îro mamosteya me, em birin seyrangehê. Em hemû heval bi kêfxweşî çûn. Dema em gihiştin cihê seyrangehê kêfa me çû û moralê me xira bû, ê ku beriya me hatibûn seyrangehê, gemara xwe vekirî hiştibûn, ne avêtibûn gemardankê. Ba jî lê dabû, hemû belav bûbû. Seyrangeh pir gemar bûbû, cihekî pak ku em lê rûnên, an jî lê bilîzin nemabû.

- Mamosteya me got, bila her kes kîsekî bigre û em vê gemarê kom bikin. Her yekî ji me kîsek girt û gemara ku li derdorê belav bûbû kom kir û kîsên xwe

xistin gemardankê. Piştî ku me destên xwe bi sabûnê şûştin û hinekî bêhna xwe veda, me ji xwe re lîst. Em bi demê nehisyan. Mamoste bang kir û got; zarokino kom bibin em ê biçin.

Derveyî seyrangehê, em kolan, rêyên dibistanê, firoşgeh, gulîstan û nexweşxaneyan jî bi kar tînin. Em di kolan û rêyan re, diçin û tên, em dibistanê bi hevalên xwe re parve dikin, bi dehan kes tên gulîstanan û bi dehan kes her roj diçin firoşgeh û nexweşxaneyan; em ji van cihan re dibêjin, cihên giştî. Pêwîst e em di van deveran de, li tenduristiya xwe û ya civakê baldar bin û amadekariyên pêwîst bistînin. Ji bo wê pêwîst e, di serî de paqijiyê bingeh bigrin. Heger di van deveran de paqijî bingeh neyê girtin, mikrob zû pir dibin û nexweşî belav dibin.

Mînak: Gerek em gemara xwe neavêjin erdê, biavêjin gemardankê. Kesên ku gemara xwe diavêjin erdê, em wan hişyar bikin. Çawa em mala xwe paqij dikin, cihê giştî jî paqij bikin.

Di destşoyê de pêwîste em destên xwe baş bi sabûnê bişon. Avdesxaneyê paqij bikin û avê berdin ser û tiştên ku avdestxaneyê bixetimînin neavêjnê.

Paceyên refên xwe, her bêhinvedanê vekin, bila bayê di hundirê refê de bê guhertin. Karbondîoksît derkeve û oksijen derbasî refê bibe. Ji ber dema em bêhina xwe distînin, oksijenê dikşînin nava xwe û dema bêhina xwe

berdidin, karbondîoksîtê der tînin û gaza karbondîoksît ji bo mirovan ne baş e. Her wiha bazdan û lîstin di refê de jî ne baş e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Cihên giştî yên li derdora me, çi ne?

2- Em çawa dikarin hewşa dibistana xwe paqij bihêlin?

3- Em ê çawa seyrangehan paqij bihêlin, nîgarekî an jî dirûşmeyekê çêkin?

4- Çend xalên cîrantiyê binivîsin û wan bi pimpimokan vekin?

5- Peyvên ku li jêr hatine nivîsandin, di veşartokê de bibîne, li ser wan xêz bike, tîpên ku mane bîne gel hev û peyvên veşartî bibîne?

GULÎSTAN - PAQIJÎ - NEXWEŞÎ - GENIM -HÊK - WERZIŞ - OKSÎJEN - ŞÎR - TIRÎ

G	U	L	Î	S	T	A	N
E	P	A	Q	I	J	Î	O
N	E	X	W	E	Ş	Î	K
I	C	Î	E	R	A	N	S
M	T	Î	R	T	I	R	Î
H	R	I	Z	Y	A	R	J
Ê	A	S	I	T	E	V	E
K	Î	N	Ş	Î	R	E	N

BEŞA 4

ARMANCA BEŞÊ

Naskirina tiştên ku jiyana me dixin metirsiyê.

WANE 1

JIYANA EWLE

Baran û xwîşka xwe taştêya xwe xwaribûn û ji bo biçin dibistanê derketibûn ser rê. Cîranê wan Ronî jî hat û bi hev re çûn. Tirimpêlên ku dihatin û diçûn pir bilez bûn. Ronî ji kêleka rê derketibû û çû bû ser rê. Ji nişkave Ronî qîr kir û reviya. Tirimpêl bi zorê li gel wî sekinî. Ew pir tirsiya.

Heya ku em çûne dibistanê jî qet nediaxivî û bêdeng çû li cihê xwe rûnişt.

Mamoste û endamekî tirafîkê ketin refê.

Mamoste: Rojbaş zarokino. Îro waneya me li ser jiyana ewle ye. Her roj em ser van rêyan diçin û tên, jiyana me di van rêyan de, pir dikeve metirsiyê. Ji bo wê îro endamekî tirafîkê dê waneyê bide we.

Ref, hemû bêdeng bû. Ronî jî serê xwe rakir li mamoste û endamê tirafîkê nerî, endamê tirafîkê rû biken bû. Çenteyê xwe danî ser mêzeya mamoste û ji çenteyê xwe hin tişt derxistin.

Endamê tirafîkê: Navê min Hogir e. Em ê îro li ser tirafîkê û bergiriyên pêwîst biaxivin.

Hûn her roj di televizyonê de, nûçeyên li ser tirafîkê tamaşe dikin. Têde bûyerên Tirimpêlan ên ku li bajaran çêbûne û hejmara mirovên birîndar bûne, radgihîne.

Hûn qet hizirîne, çima ev bûyer çêdibin?

Alan li Ronî mêze kir, piştre destê xwe rakir û got:

- Ji ber ku pîvanên tirafîkê pêk nayînin, bûyer çêdibin.

- Berfîn jî got şofêrên tirmpêlan, pir bi lez diajon, ji ber wê bûyer çêdibin.



Endamê tirafîkê: Hûn rast dibêjin, heger em pîvanên tirafîkê pêk bînin û şofêrên tirimpêlan bilez neajon, ev bûyer çênabin.

Tirafîk çi ye? Em bi vê pirsê dest bi waneya xwe bikin.

Ji çûn û hatina mirovên peya, tevgera lawiran û tirimpêlan re, **tirafîk** tê gotin. Ango tirafîk tevgera zindî û tirimpêlan e. Ji bo ewlehiyê, hin pîvanên tirafîkê çêbûne. Hûn li ser rêyan hin nîşanan dibînin. Ew nîşanên tirafîkê ne. Ji bo çûn û hatineke ewle, pêwîst e her kes van pîvanan pêk bîne. Dema ev pîvan tên

binpêkirin, bûyer rû didin û ziyanên madî û mirovî çêdibin. Dirûşmeyek mezin ji çenteyê xwe derxist û got: Ev nîşanên tirafîkê ne, bi texteyê ve vekir û wateya wan nîşanan, yek bi yek şîrove kir.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Dema hûn diçin dibistanê li ser rêya we çi nîşanên tirafîkê hene?
2- Hûn wateya nîşanên tirafîkê dizanin?
3- Nîgarekê an jî dirûşmeyekê li ser tirafîkê çêkin?

WANE 2

JI BO RÊWIYAN PÎVANÊN ÇÛN Û HATINÊ

Piştî ku endamê tirafîkê waneya tirafîkê da me, êdî em di çûn û hatina xwe de pir baldar bûn û li gorî pîvanan tevdigeriyan. Êdî nîşanên tirafîkê pir bala me dikşand. Nûçeyên li ser bûyerên tirimpêlan ên ku di televizyonê de derdiketin êdî pir xuya bûn.

Careke din, em pîvanên çûn û hatinê dubare bikin.



Di çûn û hatinê de, dema em rê derbas bikin, pêwîst e cihê ku glopên tirafêkê hebin li gorî wan tev bigerin. Li glopên tirafîkê binerin, heger glopa sor pê ket, pêwîst e em xwe ji rê dûr bikin, gilopa zer pê ket, xwe amade bikin û dema gilop kesk be bilez derbas bibin, lê pêwîst e em baznedin.

Heger cihê ku em rê tê re derbas dikin, glop tune bin, pirên ku ji bo rêyan hatine çêkirin ji wan derbas bibin. Cihê ku pir hatine çêkirin, pêwîst e em di binê pirê re neçin.

Dema ku tirimpêl sekinîbin, di navbera wan de derbas nebin. Dibe ku tirimpêleke cuda bê, me nebîne û

bûyer çêbibe. Dema em di navbera tirimpêlan re derbas bibin, em jî tirimpêlên ku bên, nabînin.

Heger di çûna dibistanê de, li ser rêya we glopên tirafîkê, yan jî pirên li ser rê, tune bin, di kêleka rê re bimeşin. Ji kêleka rê re rêka rêwiyan tê gotin û her tim xwe bidin kêleka rastê, da ku hûn tirimpêlên ku tên, baş bibînin. Dema we rê qut kir, li nîşana tirafîkê binerin. Heger nîşana tirafîkê tune be, ji birêveberiya dibistana xwe re bêjin, bila tirafîk nîşaneke tirafîkê deyne wir.

Dema bi dê û bavê xwe re, bi tirimpêlê diçin, dest û serê xwe di paceya tirimpêlê re dernexin. Tirimpêlên ku ji pêşiya we ve bên dê bibe sedema bûyeran. Heger li pêş rûniştî bin, kemera ewlehiyê girê bidin.

Tirimpêlên ku têne kolanan, bi du wan de nebezin, xwe ji pişt ve neavêjinê û xwe pêve negrin. Di kolanê de li ser rêyên tirimpêlan nelîzin.

Heger hûn dixwazin bisiklêt bajon, ji rêyên tiripêlan dûr bisekinin. An jî di rêyên bisiklêtan de bajon, heger rêyên bisiklêtan tune bin, di gulîstanan de bajon.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Rengên glopên tirafîkê, çi ne?

2- Pêwîst e em li ku bisiklêtan biajon?

3- Sûda kemera ewlehiyê çi ye?

WANE 3

BALDAR BIN

Malbata Berfîn, çûbû mêvandariya mala Ronî, her du malbat kêfxweş bûn. Ronî, Berfîn û birayê wê li koşeyekê ji xwe re dilîstin. Di demeke şûn de xwişka Ronî çû ji mêvanan re çayê anî, Peyalên çayê, ava germ û dema çayê, danîn ser mêzeyê. Peyal dagirtin û av danî cihê wê. Ji nişka ve birayê Ronî qîriya û giriya. Destê xwe avêtibû ava germ, av bi ser wî de rijiya bû û destê wî şewitîbû. Bi lez birayê Ronî birin nexweşxaneyê.

Demekê şûnde ji nexweşxaneyê hatin. Destê birayê Ronî derman kiribûn.

Di mal, dibistan û kolanan de gelek bûyer çêdibin. Bûyerên ku li malê çêdibin, piraniya wan yên pêjgehê ne. Hin caran xwarin li ser agir tê jibîrkirin, ev dibe sedema bûyeran. Her wiha li derdora xwe, hiştina amûrên ku em li pêjgehê bi kar tînin, mîna: kêr û tiştên weke wê û dermanên ku ji bo mêş û kêzikan bikar tînin jî dibin sedemên bûyeran. Hin caran, sobeyên mazotê, an jî yên elektirîkyê jî dibin sedemên bûyeran. Pêwîste dema em van amûran bi kar bînin baldar bin. Heger nebaldar bin, dê ziyan bigêje me.

Hin bûyer di dibistanê de jî çêdibin. Di dibistanê de bazdan, li ser derenceyan xişkandin, hevalên xwe dehfdayîn, derketina cihekî bilind, avêtina xwe ji ser dîwaran, derketina li ser daran û hwd, rê ji bûyeran re vedikin.

Ji bo ku em xwe ji bûyeran biparêzin, pêwîst e hin bergiriyan bistînin. Hinek ji wan bergiriyan em dikarin wan bi vî awayî rêz bikin.

- Pêwîst e bi amûrên ku jê dikin, an jî kun dikin, nelîzin.
- Dermanên mişk û kêzikan nexin nav firaxên xwarinê û li ber destên zarokan nehêlin.
- Ji cihê bilind xwe neavêjin.
- Pêwîst e bi kibrît, heste û tiştên weke wan nelîzin.
- Heger bi melevaniyê nizanibin, havînê nekevin ava çem, gol û hwd.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di mala we de herî dawî çi bûyer çêbûye?
2- Bûyereke ku hatiye serê te ji hevalên xwe re vebêje?
3- Em çawa dikarin xwe ji bûyeran biparêzin?

BEŞA 5

ARMANCA BEŞÊ

Naskirina welatê xwe ye.

WANE 1

WELATÊ ME PIR XWEŞ E

Îro wane naskirina welatê xwe ye.

Em çi qasî welatê xwe nas dikin?

Çi gel li welatê me dijîn, çi ol û bawerî li welatê me hene?

Mamoste got: Sîstema me çi ye, kî dikare bersiva van pirsan bide?

Binefşê destê xwe rakir û got:

Mamoste, welatê me Kurdistan e. Ji ber ku çemên Dicle û Firat li ser diherike, di dîrokê de jê re gotine Mezra Botan, yanî navbera du çeman.

Ji bo ku pir biberhem e, jê re dibêjin kevana zêrîn an jî ya biberhem. Em ji gelê Arî ne, gelek gel û bawerî li ser vê axê jiyane.

Mamoste: Em kurd in, wekî hevala we Binefş jî got. Em ji gelê Arî ne. Gelê Arî li ser vê axê jiyaye. Her ku miletek hatiye vir, navekî cuda lê kiriye. Sumeran bi wateya gelê çiyayî, gotine kurtî. Asûran, bi wateya cihê

avî, gotine Subarî. Yûnaniyan bi wateya navbera du çeman, gotine Mezopotamya. Ereban jî gotiye cihê ekrad. Herî dawî tirk hatine vî warê me, navê vir bi wateya xweşik bûnê, kirine Kurdistan. Em miletê vê heremê ne, ji cihekî din nehatine vir. Piştre pir milet hatine li ser vê axê jiyane.

Di welatê me de av pir e, bi ser erd û binerdên xwe dewlemend e. Hin çiyayî û hin jî deşt e û çar demsal lê tên jiyankirin.

Gelên ku li kurdistanê dijîn, lêkolîn bikin û di waneyê de bêjin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Kurd, kî ne?
2- Navê Kurdistan ji ku derê tê?
3- Li derdora we çi gel û bewerî hene?

WANE 2

KOM DENDIKA CIVAKÊ YE

Ji bo em rêxistinbûna welatê xwe û şêweyê birêveberiya wî nas bikin, mamoste em birin komînekê. Em hemû bi kêf û coş bûn. Di komîngehê de li ser deriyan hinek nivîs hebûn, dîwan, birêveberî, hola civînan û hwd. Ji ber ku hejmara me pir bû, em di hola civînan de rûniştin, hevserokên komînê jî hatin holê.

Hevserokên komînê: Hûn bi xêr hatin zarokino. Kerem bikin, hûn çi dixwazin bipirsin.

Alan: Komîn û komîngeh çi ye û çi karî dikin?

Hevserokên komînê: Komîn şêweyekî rêxistinbûna civakê ye. Di civakê de rêxistinbûna herî biçûk, komîn e, komîn, ji peyva kombûnê tê. Mirov bi awayê kom dijîn, dema ku ev kom bi zanebûn bijîn, wê demê bi rêxistin dibin. Yanî komîn rêxistinibûna civakê ye.

Em çima bikom dijîn?

Ji ber ku mirov di xwezayê de, zindiyê herî lawaz e, vê lawazbûna xwe birêxistinbûn û jiyana komî, derbas dike. Bi vî awayî zindiyê herî lawaz bi rêxistinbûnê dibe yê herî xurt.

Em di vê herêmê de dijîn. Em herî baş pirsgirêkên xwe dizanin. Kesên ji derve û dûr pirsgirêkên me weke ku em dizanin, ew nizanin. Ji ber ku pirsgirêkên me ne, em ê wan bi xwe çare bikin. Lewre komîn cihê çarekirina pirsgirêkan e.

Binefş: Karê komînê çi ye?

Hevserokên komînê:

Karê komînê ev in:

1- Bi hemû pirsgirêkên tax an jî gundê xwe re erkdar e.
2- Pirsgirêkên taxa/gundê xwe çare dike, heger pirsgirêk mezin be çarekirina wê bi meclisa bajêr re tê guftûgokirin.
3- Pirsgirêkên karê xizmetguzariyê bi şaredariyê re tên çarekirin.

4- Eger pirsgirêkeke civakî di nav tax an gund de çêbibe, wê çare dike.
5- Pirsgirêkên xwîndarî û hwd, hebin wan jî çare dike. Bi kurtasî derheqê tax û gundên xwe de biryaran dide.

Baran:

- Çima jê re dibêjin hevserokatî û çima du kes in?

Ji bo civakeke wekhev û dadî pêk were ev pêwîst e. Bi hezarê salan jin ji civakê hatiye dûrxistin. Ne hiştine ku jin derheqê civakê de biaxive yan jî tevlî rêxistinekê bibe û kar bike, ji ber jin nîvê civakê ye, pêwîst e jin cardin tevlî jiyanê bibe û jiyanê biafirîne.

Ronî:

Wekî din çi sazî û birêveberiyên me hene?

Em civaka xwe bi rêya komîn û meclisan rêxistin dikin, cihê ku şênî pir bin, li wir meclis heye. Lê cihê ku şênî kêm bin, komîn heye. Ji cihê komînê re komîngeh tê gotin. Di hemû beşên civakê de jî rêxistinîbûyîna me heye. Meclis û komîn, nûnertiya xweseriya demokratîk dikin.

Çi pirsên me hebûn, hevserokên komînê bersiva wan dan. Em jî bi kêfxweşî ji komîngehê derketin û ber bi dibistanê ve çûn.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Komîn çi ye, di rêxistinkirina civakê de çi rolê dilîze?
2- Navê komîna we çi ye, birêveberên komîna we kî ne?
3- Serdana komîngeha taxa xwe bikin, tiştên ku we kir binvîsin.

WANE 3

PERGALA ME

Piştî ku Hêlîn ji dibistanê hat, xwarina xwe xwar, alîkariya dayîka xwe kir û karê malê qediya, Hêlînê lênûs û pênûsa xwe ji çenteyê xwe derxist û pirtûka xwe danî ber xwe. Tiştek ne dihat bîra Hêlînê ku binivîse, demekê wisa sekinî piştre li dayîka xwe zivirî û jê pirsî: **Dayê, demokratî çi ye? Çima dibêjin Xweseriya Demokratîk?**

Dayîka Hêlînê: Demokrasî, şêweyekî jiyanê ye, an jî birêvebirinê ye. Ez çawa bibêjim, hûn di refa xwe de berpirsyarê refê çawa diyar dikin.

Hêlîn: Em wan dixin dengdanê, kî dengan pir bistîne ew dibe berpirsyarê refê.

Dayîka Hêlînê: Demokrasî, tevlîkirina gel ji birêvebiriyê re ye. Ji xwe demokrasî wek peyv, peyveke Yûnanî ye. Ji du peyvan pêk tê. Demos û kratos e. Demos gel e, kratos jî birêveberî ye, yanî, birêveberiya gel e. Di her welatî de cuda cuda tê pêk anîn. Di hin cihan de navê demokrasî heye, lê di birêveberiyê de bandora gel tune ye.

Hêlîn: Em beriya çend rojan bi mamosteyên xwe re çûbûn komîngehê, hevserokê komîngehê jî wisa gotibû.

Dayîka Hêlînê: Rast gotiye. Demokrasî ji bo birêveberiyê tevlîbûna gel e. Pirsgirêkên her gundî û her bajarî cuda ye. Ji ber wê şêniyên wir di derheqê pirsgirêkên xwe de biryar didin. Dema ew bixwe biryar bidin, dibe xweser. Demokrasî û xweserî dema tên gel hev, dibe Xweseriya Demokratîk.

Hêlînê spasiya dayîka xwe kir û çû ser mêzeyê, tiştên ku dayîka wê gotin nivîsand.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Demokrasî, çi ye?
2- Em di dibistanê de berpirsiyaran çawa diyar dikin?
3- Em berpirsyarên komîngehên xwe çawa diyar dikin?

WANE 4

BIGERIN, BIBÎNIN, NAS BIKIN, HEZ BIKIN

Îro waneya me pir xweş bû. Memoste filmek bi me da tamaşekirin. Film li ser cihên dîrokî û ger û geştên welatê me bû. Welatê me cihekî pir xweş e. Dîrok û xweza di nav hev de hatiye hûnandin. Piştî ku min li vî filmî tamaşe kir, welatê xwe baştir nas kir û jê hez kir. **Bav û kalên me rast gotine:** Mirov çi qasî nas bike, ew qasî hez dike.

Film, bi nexşeya Rojhilata Navîn dest pê kir û hat ser Kurdistanê. Despêkê bi cihekî dîrokî yê erdkolanê dest pêkir. Til Helef derket, spîker jî pê re cih dida naskirinin:



Til Helef

-Til Helef warekî neolotîkî ye, di dîroka mirovahî û zanistên erdkolanê de, cihekî girîng digire. Berî ku Xerabreşk bê kolan, Til Helef cihê herî kevn bû. Di xirbeyên vir de hatiye dîtin ku gund bi plan hatiye avakirin. Xaniyên ku hatine çêkirin 2 ode ne. Şaristaniyeke mezin ava bûye.

Piştî Til Helefê derbasî Girê Moza bûn.

- Girê Moza, li Rojavayê Kurdistanê, li bajarê Amûdê ye. Ev der 4000 salan B.Z ji aliyên Hûriyan ve hatiye avakirin. Li ser Girê Moza pir têşt tên gotin. Hin zanyar dibêjin, Girê Moza wek bajarekî Akadiyan hatiye avakirin. Qiralîçeya Akadî, bi qiralê Girê Mozan re zewicîye û bajar ji bo wan hatiye avakirin. Lê Girê Moza, ji akadiyan kevntir e. Hinek lêkolînvan jî dibêjin, Girê Moza cihekî perestinê bû. Di dema Mîtaniyan de rola cihekî olî ya pîroz dilîst.

Girê Moza

Hin cihên dîrokî yên din jî mîna, Til Berek, Til Hebeş û Til Xezal û li Bakurê Kurdistanê Newala Çorî, Çemê Xelan, Çemê Kote Bir, hene. Ji bilî van cihan, di quntarên Çiyayên Torosê de, bi dehan girên wisa hene, hîn nehatine kolan.

keleha Ceberê

Filim zivirî ser av û xweşikbûna xwezayê. Bi gola

Wanê dest pê kir, bi bendava Elezîzê dewam kir û bi bendava Dokan û tebqayê bi dawî bû.

Piştre zivirî ser avahiyên dîrokî, ji birca Amedê dest pê kir, bi keleha Hewlêrê û Gola masiyan ya ku Ibrahîm pêxember avêtibûn nav agir dom kir, bi Palmîra, keleha Ceber û keleha Necim bi dawî bû.

Keleha Hewlêrê

Keleha Necim, ji hêla Romayiyan ve, li hember persan di cihekî girîng de hatiye avakirin. Kelha Necim li ser keviran û du qatî hatiye avakirin. di sala 300'î de, di navbera Romanî û Sasaniyan de şerekî dijwar li vir çêdibe û Roma bibin dikeve. Dema Roma lawaz bû, ev der ket destê artêşa Ereban.

Dema film qediya mamoste got:

- Pêwîst e em welatê xwe nas bikin. Em çi qas nas bikin ewqas jê hez dikin û diparêzin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li derdora we çi cihên dîrokî hene?

2- Tu qet çûyî cihekî dîrokî? Heger çûbî, dîtina xwe bêje?

3- Em ê cihên dîrokî û xwezayî çawa bi parêzin?

WANE 5

GEL Û BAWERIYÊN DERDORA ME

Civak, ji pêkhateyên cuda pêk tên. Di civakê de neteweyên cuda, baweriyên cuda hene. Ev cudahî dewlemendiya civakê dide nîşandan. Heger ev cudahî di nav hevsengiyekê de hev temam bikin, dê ji pêşketinê re, rê vekin. Lê eger ev cudahî bibin sedemên nexweşiyê, wê bi xwe re şer û pevçûnan bîne. Ji bo wê, tu netewe ji neteweyekî din, tu bawerî ji baweriyeke din, ne baştir û çêtir e. Tu netew û bawerî ne pîroz in û ne jî xerab in.

Mamoste pirsî li derdora me çi netew, an jî bawerî hene, kî dizane?

Binefş: Mamoste, cîranekî me ereb heye, ji Reqayê hatiye. Malbatek din jî şîşan e (Çeçen), ew ji Serekaniyê hatiye.

Silava: Mamoste, cîranekî me tirkmen heye, ji Minbicê hatiye. Hin cîranê me jî xiristiyan in.

Azad: Li gundê me êzdî hene.

Mamoste: Li Rojavayê Kurdistanê û rojhilatê Sûryeyê netew û baweriyên cuda hene. Mînak, kurd, ereb, şîşan, tirkmen, aşûr, suryan, kildan, çerkes û hwd, netew hene. Ev dewlemendiyekê çêdike. Dîsa di aliyên baweriyan de jî, ev dewlemendî heye. Her çi qas herêma me bi

giranî misliman bin jî, xiristiyan û êzdî jî hene. Ji bo wê em ê sibê biçin cihê wan, wan nas bikin, xwe li gorî wê amade bikin. Çi pirsên we hebin li wir dikarin bipirsin.

WANE 6

BAWERIYA BÊ PÊXEMBER: ÊZDIYATÎ

Mamoste, em birin gundekî êzdiyan û em çûn mala şêx. Mamosteyê me, em dan naskirin û sedema hatina me jê re got. Şêx bi hatina me pir kêfxweş bû.

Şêx: Êzdiyatî baweriya gelên ku li ser axa Mezopotamyayê dijîn, yek ji baweriyên herî kevn e. Li gel me wek netewa kurd, Yezdan navê xweda ye û navê me jî ji wir tê, ango EZ-DA.

Baweriya me wisa dibêje, mirov nikarin bibin êzdî. Êzdiyatî wîrasî ye. Ji ber wê em baweriya xwe belav nakin, xwe diparêzin, pirtûka me ya pîroz,

Mishefa Reş e û pirtûka Cilwe jî pîroz e. Baweriya me bi yek xwedayî tê. Lê baweriya pêxemberan û meqamê pêxembertiyê li gel me tune ne. Pirtûkên me dibêjin: "Xweda, bêyî ku pêxember bişîne, dikare agahiyê bide mirov û rastî û şaştiyê nîşanî wî bide."

Di baweriya me de, agir, rok û av pîroz in. Sibê, nîvro û êvarê, di sê danan de berê xwe didin rokê, lava dikin û qewl dibêjin. Her sal, hefteya duyem ji meha cotanê cejna Çarşema Sor e. Her sal, êzdiyên ku li dinyayê belav bûne tên Şingalê tewaf dikin.

Niha şêniyên me kêm bûne, piraniya wan li Kurdistanê dijiyan. Lê ji ber sedemên cur bi cur koçberî çêbûye û hejmarek baş ji êzdiyan çûne Ewrûpayê.

- Baran got Xalên bingehîn ên baweriya we çi ne?

- Hin xalên baweriya me ev in:

- Dawiya dinyayê tune ye. Xwedê dinya çêkiriye, xera nake.
- Xweza pir girîng e, pêwîst e, bê parastin û jê re rêz bê girtin.
- Rojê sê danan, berê xwe didin rokê û qewlan dixwînin.

- Roja çarşemê, rojeke pîroz e, pêwîst e ev roj navber be û perestin bê kirin.
- Pêwîst e jinên me, porê xwe jênekin.

WANE 7

RÊYA AŞTÎ Û BIRAYETIYÊ: XIRISTIYANÎ

Mamosteyê me îro jî em birin dêrekê, ji bo em di derheqê ola, xiristiyaniyê de agahiyên rast ji dêrê bigrin. Mamoste ji me re gotibû: “Çi pirsê we hebin, bipirsin.”

Keşeyê dêrê li ber derî pêşwazî û bixêrhatina me kir. Mamosteyê me sedema hatina me ji keşe re got:

Piştre em bi keşe re li dêrê geriyan. Dêr bi nîgarên Mesîh û dayîka wî Meryem hatibû xemilandin.

- Berfînê pirsên xwe li ser hev kirin, xiristiyanî, oleke çawa ye? Kîjan gel pê bawer dikin? Di herêma me de çi qas bi bandor e?

- Xiristiyanî, oleke yek xwedayî ye. Cihê derketina wê Rojhilata Navîn e. Lê li Ewrûpa, Emerîka û parzemînên din zêdetir belav bûye. Ola me baweriyê bi xweda û pêxemberên wî têne. Navê pêxemberê me, Îsa ye. Ji bo wê ji me re dibêjin **Khristianos**. Ango kesê bi dû Îsa de diçû, navê pirtûka me Incîl e, tê wateya Mizgînî.



Ola me, oleke aştiyane ye. Zor û stemkariyê napejirîne û stemkariyê li kesî nake. Parvekirin, biratî û dadê bingeh digre.

Niha li cîhanê ola herî pir belav bûye û şêniyên wê pir in. Ji her netewe û her zimanî kesên xiristiyan hene. Ji ber wê ne ola neteweyekî tenê ye.

Di herêma me de, berê bi bandortir bû. Her ku çû, lawaz bû, koçberî çêbû. Her wiha di herêma me de gelên ermen, asûr, suryan û kildan xiristiyan in û hejmareke kêm di nav kurd û ereban de jî hene.

Mesîh, mirovan wek hev dibîne. Cudatî naxe nav mirovan, hemû mirov ne pîroz in û ne jî xerab in.

- Xiristiyan hemû yek in, perestinên wan wek hev in?

- Bi giştî xiristiyan wek hev in. Di nav xiristiyanan de jî rêbaz çêbûne. Gotinên mesîh li gorî xwe şîrove kirine. Di şêweyên perestinê de cudahî heye. Lê xalên bingihîn yek in.

WANE 8

OLA SELAMÊ: ISLAM



Mamosteyê me vê carê jî me bir mizgeftekê. Dema em çûne mizgeftê, şêniyên taxê di mizgeftê de nimêj dikirin. Heya nimêja wan bi dawî bû, em li hewşê sekinînin. Piştî nimêj bi dawî bû şênî belav bûn, em jî çûn gel mele. Mamosteyê me, em dan naskirin û sedema hatina me jê re got: Mele, bi xêrhatina me kir û dest bi danasîna ola xwe kir:

- Ola me, oleke yek xwedayî ye. Berdewamiya pêxember Ibrahîm e. li nîvgirava Erebistanê, di nav ereban de, di sedsala 6'an de derketiye. Wek peyv, islam, ji selamê tê. Ew jî tê wateya aştiyê. Bi wateya felatê jî tê bikar anîn. Li gorî ola me, rêya felatê, azadî, selametî û rêya aştiyê, teslîmbûyîna xwedê ye. Ji xweda tenê re serîtewandin e. Ji xwe, ji bilî xweda re serîtewandin ne rast û ne baş e. Pirtûka ola me Qur’an e. Kesên ku baweriya xwe bi vê olê anîne, misilman in.

Di ola islamê de, nabe ku mirov baweriya xwe bi hin tiştan bîne û bi hin tiştan neyne. Bawerî pêwîst e tam be; nîv bawerî ne rast e. Hin mercên ola me hene, kî dibe misliman, divê van mercan pêk bîne.

Ola me li cîhanê pir belav bûye. Piştî xiristiyaniyê ola duyem e. Bi taybet ereb, kurd, tirk û gelên herêmê pê bawer dikin. Her wiha misliman li Amerîka, Ewrûpa, Çîn û li cihên din jî hene.

Ola me di bingehê xwe de wekhev e, lê di pêkanîn û şîrovekirinê de cudatî heye. Rê li ber mezheban vekiriye.

Bajarên Mekke û Medîne ji bo ola me pîroz in. Her sal, bi sed hezaran mirov, ji cihên cuda tên wir tewaf dikin û dibin hecî.

Li gorî baweriya me, cudahiya erebekî ji ecemekî tune ye, yanî hemû mirov wekhev in. Tu kesê pîroz an jî xerab tune. Her kes bi karê xwe dibe baş, an jî dibe xerab.

WANE 9

BI HEV RE KAR BIKIN Û BI HEV RE JÎ BI PARÊZIN

Baran û bavê xwe wê biçûna bajêr. Derketin ser rê. Baraneke hûr dibariya, li kêleka rê cihê rawestandinê hebû.

- Bavo baran dibare em biçin, cihê rawestnandinê.

Baran û bavê xwe cûn cihê rawestandinê, yek du kesên din jî li wir bûn. Lê cih hatibû xerabkirin, bilatên wê şkestî bûn, cihên rûnistinê şkenandibûn bûbûn cihê gemarê. Baran li van xerabiyan mêze kir û nîşanî bavê xwe da.

Bavê Baran:

Baran, cihên wiha, cihên giştî ne, pêwîst e em hemû bi hev re biparêzin û qirêj nekin. Tu dibînî ev der çawa qirêj kirine, em jî bêzar dibin. Kesê şkenandiye, an jî qirêj kiriye, pêwîst e em wî şiyar bikin. Her wiha divê em ji komîna gund re bibêjin, da ku van deran paqij û çak bikin.

Bi hatina foksa gund re Baran, bavê xwe û kesên ku li wir sekinîbûn siwar bûn û çûn.

Bavê Baran: Ne tenê ev der, bexçeyên zarokan ên ku hûn lê dilîzin, pêwîst e hûn biparêzin, nehêlin kes ziyanê

bighîne amûrên bexçe û bexçe qirêj bike. Heger qirêj jî bibe, dema hûn çûn, bexçeyê lîstokan, pêşî wir paqij bikin, piştre bilîzin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li derdora we çi cihê giştî, hene?
2- Paqijiya bexçeyên zarokan çawa ye?
3- Ji bo kesên ku van deran baş naparêzin, em çi bikin?
4- Peyvên ku li jêr hatine dayîn xêz bikin û tîpên ku mane bîne gel hev û peyvên veşartî bibînin.

KURDISTAN - GIRÊ MOZA – KOMÎNGEH - TIL XELEF - QELA NECIM – PALMÎRA – PERGAL - MECLIS – DEMOKRASÎ - DICLE

K	G	R	Ê	M	O	Z	A	K	W
O	P	A	L	M	Î	R	A	U	Q
M	E	C	L	I	S	E	L	R	E
Î	R	O	J	A	V	A	A	D	L
N	G	T	D	I	C	L	E	I	A
G	A	D	O	K	A	N	P	S	N
E	L	A	R	F	I	R	A	T	E
H	A	M	U	D	Ê	Ê	Z	A	C
T	I	L	X	E	L	E	F	N	I
D	E	M	O	K	R	A	S	Î	M

5- Bersiva mamikan dizanin.

a- Qasimê bilingekî, çû şerê darê, darê anî xwarê

b- Deveyê bi bar, çû zinar.

b- Pezê hema, berda çema, heya sibeh, kit jê nema

ROJA ZIMANÊ KURDÎ

Her sal 15 gulanê weke Cejina Zimanê Kurdî tê pîrozkirin. Celadet Elî Bedirxan, di 15'yê gulana 1932'an de li Şamê bi navê "HAWAR" kovarek derxist. Ev kovar, çend hêjmarên despêkê bi tîpên erebî û latînî derketin, piştre tenê bi tîpên latînî derket. Roja ku kovarê dest bi weşana xwe kiriye, ew roj weke Cejina Zimanê Kurdî tê pîrozkirin.

Di vê kovarê de rewşenbîrên kurd, mîna: Celadet, Rewşen, Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Nûreldîn Zaza, Mistefa E. Botî, Qadir Cemal Paşa û hinek rewşenbîrên din jî tê de dinivîsandin.

Kovara HAWARê, di dîroka kurdan de weşana yekem bû ku bi tîpên latînî çap bûye. Her çi qas, di

1929'an de li yekîtiya Sovyetê hin ceribandinên latînî çêbûbin jî, lê li Kurdistanê cara yekem bû.

Dewletên ku Kurdistan dagir kirine, nehiştine zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê û bi pêş bikeve. Siyasetên qirêj bêtir li ser ziman pêk tanîn. Axaftina bi kurdî bû sedema girtin, îşkence û zindanan.

Bi têkoşîna Azadiya Kurdistanê re, pêşketinên siyasî yên ku çêbûn û pêşketina çapemeniya kurdî, bandoreke erênî li pêlşketina zimanê kurdî kirin.

Bandora enstutî, dibistanên taybet û kursên taybet jî, di pêşketina zimanê kurdî de hebû. Lê bi avabûna, Saziya Ziman û Wêjeya Kurdî, ziman bi rêk û pêk bû û dîtina perwerdeya zimanê kurdî piştî şoreşa 19 Tîrmehê, bi rengekî fermî di bibistanan de, bi pêş ket.

BEŞA 6

ARMANCÊN BEŞÊ

1- Naskirina şînatî û lawiran.
2- Rola şînatî û lawiran, di jiyana mirovan de çi ye?

WANE 1

JIYAN DI XWEZAYÊ DE

Demsal guherî, serma kêm bû, gul û çîçek vebûn, çûk dixwînin, me jî cil û bergên xwe yên buharê derxistin. Me dixwest, em her dem li derve bin. Mamoste got, îro em ê waneyên xwe li derve bibin. Em bi kêfxweşî hemû derketin derve.

- Waneya me ya îro li ser şînatî û lawiran e. Lawir û şînatî çawa bandorê li jiyana me dikin?

Kî dizane, li derdora me çi şînatî û lawir hene? Em çawa sûdê ji wan digrin?

Me hemûyan li hev nerî, kesî deng nekir. Mamoste berdewam kir:

- Di jiyana mirovan de cihê şînatî û lawiran pir girîng e. Em ji gelek aliyan ve sûdê ji wan digrin, debara me li ser wan e. Heger lawir û şînatî tune bin, dê mirov jî tune bin. Ango hebûna me bi wan ve girêdayî ye.

Hin şînatî dar in: Amûrên me yên dibistanê, wek lênûs, pênûs, pirtûk û hin amorên din, wek mêze, kursî, textên razanê, dolabên cilan, keştî û hwd, jî ji daran çêdibin.

Hin dar mêwe digrin û em mêweyên wan dixwin, hin lawir hêlînên xwe li ser daran çêdikin û hin lawir daran ji xwe re dikin war mîna: mêşên hingiv û sivoriyan.

Hin şînatî giya ne: Mirov û lawir wan dixwin û debara xwe li ser wan didomînin. Genim, nîsk, nok, beqdenûs, pûng, kelem û hwd. ev hemû tên xwarin û wek derman jî tên bikaranîn û nexweşiyan baş dikin. Tê gotin ku

bijîşkiya xwezayî li ser van şînatiyan pêş dikeve. Hin cil û bergên me jî ji şînatîyan e. Mîna pembû.

Şînatî, xweşikbûna cîhana me ne. Vebûna kulîlkên rengereng cîhana me xweşik dikin. Her wiha bi pelên xwe, bayê qirêj distîne û paqij dikin, ango bayê paqij dide.

Wek şînatiyan lawir jî bandorê li jiyana me dikin. Em goşt, hêk û şîrê wan dixwin û vedixwin.

Hin lawir hene ku em ji hêz wan sûd digrin. Bi wan cot dikin, bar dikşînin, di çûn û hatinê de bi kar tînin. Wek: hesp, ga, ker, hêştir û hwd.

Ji çerm û hiriya hin lawiran sûd digrin. Hin cil û berg û pêlavên me ji lawiran çêdibin. Mîna Bizin, mih û hwd.

Em goştên masiyan, hêkên mirîşkan, şîr û mastê çêlek û bizinan û goştê hemûyan jî dixwin.

- Şînatî li ku û çawa çêdibin? Lêkolîn bikin.

Ev karê we yê malê ye. Waneya me sibe wê li ser vê mijarê be.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Nîgarekî şînatî û lawiran çêkin.
2- Sûdên şînatî û lawiran bibêjin.
3- Malbata we lawirn xwedî dikin û kîjan lawiran xwedî dikin?

WANE 2

ŞÎNATÎ LI KU DEVERÊ Û ÇAWA ŞÎN TÊN?

Alan, xwarina xwe xwaribû, ji xwe re li televizyonê temaşe dikir. Piştre çû gel bavê xwe û jê pirsî:

- Bavo, mamoste îro karê malê daye me. Şînatî li ku deverê û çawa şîn tên. Ka ji min re bibêje. Heta ku ez jî, sibehê li dibistanê, ji hevalên xwe re bibêjim.

Bavê wî: Ji her şînatiyekî re, taybetyên cuda hene. Hinek ji germê hez dikin, hin ji sermayê hez dikin. Hin li daran dikevin, hin li ser êrdê û hinek ji wan jî di bin êrdê de çêdibin.

Alan: Çawa bavo, ka mînakan bide?

Bavê wî: Mînak, piraniya mêweyan li daran dikevin, wek: pirteqal, sêv, hirmî, gilyaz, tû, mişmiş û hwd. Ji wan sêv û gilyaz li cihên sar tên çandin. Lê pirteqal û lîymon li deverên sar nikarin bijîn.

Tûfrengî û ananas mêwe ne, lê li daran nakevin, wek giya li ser erdê şîn tên û ber didin. Şîlan û hinek mêweyên weke wê jî ne dar in lê giya ne, li deviyan dikevin.

Bacanên reş, bacanên sor, îsot, xiyar, gêzer, kartol û hwd. Sebze ne, di zeviyan de, tên çandin. Hinek ji wan li

ser rûyê erdê çêdibin, hinek ji wan di binê erdê de çêdibin. Mînak, gêzer, tirp û kartol di bin erdê de çêdibin. Bacanên sor, bacanên reş, xiyar û îsot jî li ser erdê çêdibin. Ev jî li gorî germê diguherin. Bikaranîna çadirên naylon û hin amûrên din, di her cihî de çêdibin. Lê ev ne xwezayî ne.

Alan: Bavo, ev sebze û mêwe çawa tên xwedîkirin?

Bavê wî: Tê bîra te dema em çûbûn gund, mala xalê te.

Alan: Erê bavo.

Bavê wî: Te dît, li ber deriyê wan trektor hebû. Bi trektorê erdê cot dikin û li hin herêman bi hêza lawiran jî cot dikin. Piştî erdê cot dikin, erdê xêz dikin, ştilan diçînin, an jî tov pê werdikin. Ev kar, hin caran bi destan û hin caran jî bi makîneyan tê kirin. Di dema wê de av didin. Heger nexweşî lê bide derman dikin. Ji bo ku

baştir çêbibin, gubreya xwezayî an jî gubreya kîmyayî lê dikin.

Alan: Ma nexweşî li şînatiyan jî dide bavo?

Bavê wî: Erê, nexweşî li şînatiyan jî dide.

Destpêka buharê, daran diçînin, heger berê hatibin çandin, wan dikesixînin, axa dora wan mer didin. Gubreya xwezayî, an jî ya kîmayayî berdidin ber koka wan û di dema guncaw de av didin. Heger nexweşî hebin, derman dikin.

Alan: Spas dikim bavo.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Malbata we çi diçîne?
2- Li derdora we çadirên naylon hene? Di wan de çi diçînin?
3- Tu jî tiştekî biçîne?

(Qutiyekê tije ax bike, hin gubreyê lawiran tevlê bike. Libên fasûliyan an jî nokan têxê. Hin caran av bide an jî darekê bîne û biçîne)

Bersiva mamikan dizanî?

a- Şaşik li ser serî ye, bang dide lê ne mele ye.
b- Dengbêjekî zelal e, ji miletê xwe re neyar e.
c- Reş e mîna qîr, spî ye mîna şîr, diçe mîna mîr.

WANE 3

ALIYÊN XWE NASBIKIN

Dema dibistan ket betlaneyê, Alan çûbû gund mala bapîrê xwe, hin lawirên bapîrê wî hebûn. Hin caran bi şev ew berdidan û dibir çolê. Rojekê Alan jî bi bapîrê xwe re çû. Lawirên xwe dan pêşiya xwe, çûn heya kontarê daristanê. Lawir ji xwe re diçêriyan. Alan û bapîrê xwe jî agirekî biçûk ji xwe re pêxistin û li ber rûniştin.

Alan: Bapîr, ma tu qet rêya xwe şaş nakî, tu çawa aliyên xwe dizanî?

Dapîrê wî: Hinek zanabûn û hinek tecrûbe ji bo vê pêwîst in. Dema mirov li cihekî gelekî diçe û tê, wê deverê ji ber dike, zû bi zû ji bîr nake û rêyên xwe winda nake.

Ya girîng ew e ku mirov ji xwezayê fêr bibe

Alan: Çawa bapîr?

Dapîrê wî: Ka li asman binere, ew stêrka ku diberiqîne tu dibinî.

Alan: Belê

Dapîrê wî: Ew stêrka cemserê ye. Her dem aliyê bakur nîşan dide, dijberî wê başûr e. Eger em berê xwe bidin, stêrkê, destê me yê rastê rojhilat û destê me yê çepê jî rojava nîşan dide.



Hêdî hêdî ro hilat û tîrêjên wê ji pişt çiya derdiketin, bapîrê Alan got:

- Em bi rêya rokê jî dikarin aliyên xwe nas bikin. Rok her dem ji aliyê rojhilat ve hil tê û ji aliyê rojava ve diçe ava. Heger em destê xwe yê rastê bi aliyê rokê ve vekin, destê me yê rastê dibe rojhilat, destê me yê çepê jî dibe rojava. Pêşiya me dibe bakur, paş me dibe başûr.

Alan: Babîr me ev, par di waneyên xwe de dîtibûn.

Dapîrê wî: We derveyî vê çi dît?

Alan: Bi rêya konê moriyan jî em dikarin aliyên xwe nas dikin. Ji bo ku bakur sar e, morî, axê ji kona xwe derdixin, dibin aliyên bakur. Aliyên başûr jî vekirî dimîne.

Dapîrê wî: Her bijî, te waneyên xwe baş girtine. Tu vê dara ku kevz li ser e dibinî?

Alan: Erê.



Dapîrê wî: Dar û kevir, ji sermayê bandor dibin. Aliyê bakur kevz digre da ku wan biparêze. Kevz her dem, aliyên bakur nîşan dide. Eger em jî berê xwe wek kevzê bidin bakur, pişta me dibe başûr. Heger em destên xwe vekin, milê me yê rastê dibe rojhilat, milê me yê çepê jî dibe rojava. Te nas kir? Ka bêje niha çend alî hene?

Alan: Ez vê dizanim bapîr, çar alî hene: Bakur, başûr, rojhilat û rojava ne. Me di waneyên xwe de biribûn.

Dapîrê wî: Pir baş e, tu zû fêr bûyî. Ev çar aliyên ku te gotin, aliyên bingehîn in. Di navbera her du aliyan de aliyê navber jî heye.



Aliyên navber jî ev in:

1- Di navbera başûr û rojhilat de başûrê rojhilat heye.

2- Di navbera bakur û rojhilat de bakurê rojhilat heye.

3- Di navbera başûr û rojava de başûrê rojava heye.

4- Di navbera bakur û rojava de bakurê rojava heye.

Rok tam derketibû. Bapîrê wî got:

- Alan, em hêdî hêdî biçin malê, dema bêriyê ye. Em lawiran bibin malê bila dapîra te wan bidoşe.

Alan û bapîrê xwe, lawirên xwe dane pêşiya xwe û berê xwe dane malê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Aliyên navber, çi ne?
2- Bi şev em çawa dikarin aliyên xwe bibînin?
3- Li darekê, an jî kevirekî binere û aliyên xwe bibêje?

Bersiva van mamikan dizanî:

a- Çar bira ne, çar diyar yek hênik e, yek germ, yek şilî ye, yek sar e.
b- Mencela indelî, pirç pirç dikelî, ne agire ne xwelî ye.
c- Hat wekî mîra, rûnişt wekî wezîra, çû wek feqîra.

EWANE 4

TENDURISTIYEKE SAXLEM, BI PAKBÛNA XWEZAYÊ GENGAZ E

Mirov zindiyekî ji xwezayê ye. Xweza bandorê li mirov dike. Heger av, ax û ba qirêj bibin, bandoa xwe li mirovan jî dike û tenduristiya wan xira dike. Ji bo wê pêwîste em wan baş biparêzin. Mamostaya me û mirovek bi hev re ketin refê. Ev cara yekem bû ku em vî mirovî dibînin, bala me kişand.

Mamoste: Ev heval, ji saziya jîngehê hatiye, dê hin agahiyan li ser xweza û parastina wê bide me. Di dawiyê de çi pirsên we hebin hûn dikarin jê bipirsin.

- Navê min Elî ye, wek ku mamoste jî got ez ji saziya jîngehê têm. Ji bo ku em di jingeheke baş de bijîn, hin erk dikevin ser milên me. Heger em van erkên xwe pêk neyînin, jingehek baş namîne.

Zanyarên cîhanê dibêjin ku ji derveyî cîhana me tu cihekî din ku em lê bijîn tune ye. Ji

ber vê yekê pêwîst e em nirxê cîhana xwe bizanin.

Kesên çav birçî, ji bo berjewendiyên xwe, cîhana me xerab dikin. Her tiştî dikin, daran jê dikin, av û hewyê qirêj dikin û naparêzin.

Lê pêwîst e em xwezaya xwe bi parêzin. Ji bo wê her dem em daran biçînin, şînkayiyan jê nekin; pir bikin. Her şinkayî pir bibe, wê hewaya me paqij bibe. Heger em daran biçînin, dema ku barana pir bibare, lehî ranebe û ax naşemite. Ji ber dar bi kokên xwe axê digrin.

Mînak, di mala we de dayîka we, tiştan diqelîne, ne wisa? Piştî ku qelandina xwe xelas dike, wê zeytê dirjîne. Lê zeyta qelandî pir ziyanê dide xwezayê. Heger em birjînin nav avê, avê jî qirêj dike, a herî baş ew e ku em têxin şûşeyekî, devê wî bigrin û têxin bin erdê, da ku ziyana wê belav nebe.

Her wiha betariyên glupan, kîsên naylon û şûşeyên naylon jî navêjin derdorê. Ev tişt bi sedê salan, di nav axê de xera nabin û qirêjê çêdikin.

Ji bo jiyaneke tendurist pêwîst e em jîngeha xwe bi parêzin. Ji bîr nekin, **ev cîhan mîrasa bav û kalên me ye, ji me re maye û emanet neviyên me ye**. Pêwîst e em vê emanetê baş biparêzin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Paqijiya derdora me çawa ye?
2- Ji bo paqijiya av, ax û hewayê em dikarin çi bikin?
3- Ji bo parastina jîngehê nîgarekî çêke, an jî dirûşmeyekê binvîse?
4- Peyvên ku hatine dayîn, xêzk bike, tîpên ku mane bînin gel hev û peyvên veşartî bibînin.

JINGEH - JIYAN - STÊRKA CEMSER - BAKURÊ ROJAVA - KEWS - DARISTAN - BETARÎ - KÎSÊN NAYLON - BACANÊ SOR - KAXIZ - DERMAN - ŞITIL - EZMAN - RIZGAR - TAX - KOMÎN - TIVIR - ZIMAN - DAD

J	Î	N	G	E	H	G	I	Z	E	R	S
I	Ş	I	T	I	L	E	V	I	C	Î	T
Y	E	H	A	N	B	K	O	M	Î	N	Ê
A	Z	Û	M	D	A	D	E	A	N	T	R
N	M	E	W	E	Î	A	R	N	A	I	K
B	A	K	Û	R	Ê	R	O	J	A	V	A
E	N	A	S	M	E	I	E	M	A	I	C
T	A	X	N	A	E	S	T	Ê	N	R	E
A	Z	I	A	N	R	T	O	K	A	E	M
R	I	Z	G	A	R	A	N	K	E	W	S
Î	E	B	A	C	A	N	Ê	S	O	R	E
K	Î	S	Ê	N	N	A	Y	L	O	N	R

ROJÊN DIYAR

ROJA DAR Û DARISTANAN

Cihê ku darên wê pir bin, jê re daristan tê gotin. Hin daristan bi cureyekî daran çêdibin, hin daristan jî pir cure ne. Mînak daristana sinoberê. Li daristanan ne tenê dar hene, zindiyên cuda cuda jî hene. Ji bo wê daristanên welatekî, hem xweşikbûna wê ya xwezayî ne, hem jî dewlemendiya wê ne.

Daristan rê li be herikîna axê û lehiyan digre. Hevsengiya avhewayê çêdike. Amûrên ku em rojane di jiyana xwe de bi kar tînin, gelek ji wan jî daran çêdibin. Mînak: lênûs, pênûs, pirtûk, kursî, mêze, dolabên pêjgeh û yê cilan, textê razanê, derî û paçeyên xaniyan

û hwd, ji daran çêdibin. Her wiha di çêkirina hin dermanan de jî dar tên bikaranîn. Daristan hewaya qirêj, paqij dikin. Pişa cîhanê ne.

Ji ber wê yekê divê em dar û daristanan bi parêzin. Çi qas ji destê me bê em daran biçînin, bikaranîna kaxezan kêm bikin. Dema em diçin seyranan, divê em li daristanan agir pê nexin, eger me pê xist, em baş vemirînin. Heger em baş venemirînin û ba lê bide dê çirûskên agir, bikevin nav giya û şewat derkeve. Ji ber wê pêwîste em baldar bin, baş vemirînin.

Ji dîrokê, heya roja me ya îro, ji bo ku daristan ne hatine parastin, xerab hatine bikaranîn, dar nehatine çandin, li cîhanê her ku diçe daristan kêm dibin. Cihê

ku daristan lê nenemane, dibe biyaban. Ev rewş bandorên nebaş li tenduristiya mirov dike.

Parastin û pirkirina daristanan erkekî welatparêzî ye. Em dikarin bibêjin welatparêzê baş ew e yê ku, av, ax û daristanên welatê xwe diparêze.

Li gorî herêman, her sal meha avdarê an jî destpêka cotanê, dema çandina daran e. Heger hewa germ bibe zûtir jî tên çandin. Di dawiya avdarê, an jî serê cotanê, heftiyek ji bo daristanan bê diyarkirin. Di vê heftiyê de giraniyê bidin çalakiyên ji bo dar û daristanan.

Her sal, 4'ê nîsanê weke roja çandina daran tê pîrozkirin. Di vê rojê de, dar tên çandin, pîrozbahî tên lidarxistin.

Bersivên mamikan bigiştî:

1- Telefon
Radyo
Seat

2- Zebeş
Behîv
Mêwe
Tirî
Şerab

3- Bivir
Kefçî
Stêrk

4- Dîk
Kew
Qijik

5- Sal
Havîn
Berf

Belavkirina Waneyan li Ser Sala Xwendinê

Heftî / Meh	Heftiya Yekem	Heftiya Duyem	Heftiya Sêyem	Heftiya Çarem
Rezber			Xwe nas bikim	Taybetiyên me banodrê li derdora me dike
Cotmeh	Hilbijartina hevalên xwe	Çalakiyên dibistana me	Em bi hev re xurt in	Derfetên xwe baş bikar bînin
Mijdar	Pîşeyên xwe hildibijêrim	Jiyan di mala me de	Cîrantî	Nexşe
Berfanbar	Em bi hev re alîkar bin	Teknolojî di mala me de	Başbikaranîn	Girîngiya çêkirina bernameyê
Rêbendan	Roja mafê mirovan	Lêveger	Bêhinvedan	Bêhinvedan
Reşemeh	Jiyana tendurist - |Kirîna bi zanebûn	-Her tişt di dema xwe de xweşe - Bila her der paqij û xweşe be	- Jiyana ewle - Ji bo rêwiyan pîvanên çûn û hatinê	- Baldar bin - welatê me pir xweş e
Avdar	- Kom dendika civakê ye - Pergala me	Bigerin, bibînin, nas bikin, hez bikin	- Gel û baweriyên derdora me - Baweriya bê pêxember: êzdîtî	Rêya aştî û birayetî: xiristiyanî Ola selamê: islam
Cotan	- Bi hev re kar bikin û bi hev re jî bi parêzin - Roja zimanê kurdî	- Jiyan di xwezayê de - Şînatî li ku deverê û çawa çê dibin?	Aliyên xwe nas bikin	Tenduristiyeke saxlem, bi pakbûna xwezayê re gengaz e
Gulan	Roja dar û darıstanan	Lêveger		